# 1 Hezîranê Rojnameya we Azadiya Welat li bayiyan e!..



Azadiya Welat
Zarokên kurd ên dîlgirtî
RÊBERÊ PKK'Ê ABDULLAH OCALAN DÎSA BANGA DIYALOGÊ KIR
'Heta meha hezîranê divê gav bên avêtin'
KDP-Îran: Başûrî erênî nêzîk nabin

## MÎHRÎCANA ÇAND Û HUNERÊ YA AMEDÊ ÎRO YE

# Mîhrîcana Amedê îro dest pê dike




*9'emîn Mihrîcana Çand û Hunerê ya Amedê ku îro dest pê dike, dê 4 rojan berdewam dike. Di bernameya îro de ji bilî pêşangeha wêneyan, şano û Navenda Çand û Hunera Dîcle Firatê, ji bo bîranîna Mamoste Selîm Çevik dê li avahiya navenda çandê konserekê bide. Saet di 19.30'an de di çarçoveya danasîna bernameyê de dê Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr axaftina vekirina bernameyê pêk bîne. Roja yekem a mihrîcanê dê bi konsera Mehmet Akbaş û Ayfer Duzdaş a li Salona Tiyatro ya Anfî ya Sumer Pakê bi dawî bibe. Her wiha di çarçoveya mîhrîcanê de ji fîlmên welat û yên derveyî welat bi tevahî dê 21 fîlmên sînemayê bêne nîşandan...* RÛPEL - 6



## Wêneyên Yilmaz Guney ên nû hatin weşandin

Derhênerê kurd ê di cîhanê de navdar Yilmaz Guney wêneyên ku di sala 1982'yan de li Mihrîcana Cannesê kişandibûn di arşîva sînameger Hasan Karabulut de hatin dîtin. Di wêneyên Yilmaz Guney ên ku 27 sal berê li Cannesê kişandibû û heta niha li tu cihî nehatiye weşandin de îmgeyên gurûr, xemgînî, kêfxweşî û xwebaweriyê derdikevin pêş... RÛPEL - 6


# Hawar

Rojnameya Rojane

27 Gulan 2009
Çarşem
Sal: 1
Hejmar: 22
Buha: 50 Kr


# 'Em serî natewînin'



Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk ku di civîna koma partiyê de axivî bal kişand ser nîqaşên çareseriya pirsgirêka kurd û banga agirbesta fiîlî kir. Turk der barê xwesteka dadgehê ya darizandinê de jî axivî û wiha got: 'Tu hêz nikare serî bi me û têkoşîna me bide tewandin'

### 'MAKEQANÛNEKE NÛ LAZIM E'

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk bal kişand ser nîqaşên demên dawî di warê çareseriya pirsgirêka kurd de tên meşandin û ev tişt gotin: "Gel biryara xwe daye. Gel azadî, demokrasî, aştî û edaletê dixwaze. Li vir wezîfe dikeve berê Meclisê. Lazim e meclis Makeqanûneke nû ya demokratîk çêbike. Ev erka meclisê ye."

### 'ME KINCÊ JI AGIR LI XWE KIRIYE'

Turk, bal kişand ser operasyona piştî hilbijartina herêmî li hemberî DTP'ê hatiye destpêkirin û wiha got: "Xeta partiya me ya siyaseta demokratîk tê darizandin. Bedêla wê çi dibe bila bibe em bi tu awayî dest ji vê doza xwe bernadin. Me ev kincê ji agir bi zanebûn li xwe kiriye."... R.4

TIMESONLINE
NEWS COMMENT BUSINESS MONEY SPORT LIFE & STYLE TRAVEL DRIVING
PKK leader offers Turkey an olive branch to end war



## Karayilan ji Timesê re axivî

**Rojnameya îngilîz The Times hevpeyvîneke bi Serokê Konseya Rêvebar a Koma Civakên Kurdistanê Murat Karayilan re hatiye çêkirin weşand. Hevpeyvîna nûçegihanê The Timesê Anthony Loyd li çiyayê Qendîlê bi Karayilan re çêkiriye deng veda. Karayilan di vê hevpeyvînê de pêvajoya bêçalakîbûnê ya Koma Civakên Kurdistanê ku heta 1'ê Hezîranê dom bike nirxand...** RÛPEL 4

# Merasîma cenazeyên wan hêjayî wan bû

Cenazeyê Endamê HPG'ê Alî Îhsan Îke (Alî Gever) ku di 22'yê gulanê de li çoltera navçeya Licê jiyana xwe ji dest da, ji hêla 50 hezar kesî ve hate definkirin. Di merasîma cenaze de biryara bêçalaktiyê ya KCK'ê hate bibîrxistin û hate xwestin ku ji bo sekinandina xwînê bersiv bê dayîn. Her wiha cenazeyê Endama HPG'ê Leyla Şavli jî li gundê Gare yê bi ser navçeya Şemzînanê ya Colemêrgê ji aliyê bi hezaran kesî ve hate definkirin... RÛPEL - 3



## Şervanên me...

Darbestên çekdarên me yên ku di vê demsalê de tên, birînên wan ji gezkirina Koremar in. Ji bo ku bêhna bêwîjanê seh bikin, milê xwe bidin bin darbesta wan... *Adil ZOZANÎ* - R.2

## Li ber çavê bapîrê mêrê wê tecawiza cerdevanan

Jina bi navê Ş. A. ku beriya 14 salan bi bapîrê hevserê xwe Mecît Aydin re hate binçavkirin, piştî birin qereqolê li ber çavê bapîrê hevserê xwe rastî tecawiza leşker û cerdevanan hat. Derket holê ku Ş. A. piştî di bin çavan de rastî tecawizê hat psîkolojiya wê xira bû û roja ji bin çavan derketî jî întihar kiriye. Malbata Aydin piştî 14 salan der barê leşker û cerdevanên tecawizkar de dozê vedike. Derket holê ku yek ji wan cerdevanan endamê meclîsa şaredariyê yê AKP'ê ye... RÛPEL - 3

## Hin derdor çareseriyê asteng dikin

Kesên hêza azadî û demokrasiya kurd red dikin, nêzîkatiya xwe ya li dijî çareseriya demokratîk didin xuyakirin. Kesên li dijî çareseriyê ku di ekranên televîzyonan de nêrînên xwe tînin ziman, li dijî hêzên azadî û demokrasiya kurd dibin yek. Li dijî çareseriyê, hêza xwe dikin yek. Divê baş bê zanîn ku ev kes, di nava lîstikek pir xeternak de ne. Ew dewama Ergenekonê ne.... *Nivîsa Cemal ŞERÎK* - R.2

## Walîtiyê dest danî ser komeleya jinan

**WALIYÊ** Bedlîsê dest danî ser defterên Komeleya Guldunyayê û der barê komeleyê de lêpirsîn da destpêkirin. Piştî peyama Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan komela na divê akademî bê vekirin walîtiya Bedlîsê peyam wekî îxbar nirxand û der barê komeleyê de lêpirsîn da destpêkirin. Jinan der barê biryara walitiyê de nerazîbûn nîşan da... RÛPEL - 7

## Şêwirgeh

Cemal Şerîk

# Agir bi benzînê nayê vemirandin

Pirsgirêka kurd rojeva xwe ya bingehîn diparêze. Gelek derdor û kesên cuda der barê pirsgirêka kurd de fikr û ramanên xwe vedibêjin. Ev fikr û ramanên der barê pirsgirêka kurd de nîqaşên nû bi xwe re tînin. Di van nîqaşan de aliyên balkêş derdikevin holê. Di van nîqaşên ku têne meşandin de, tê dîtin ku gelek nêrînên cuda li hemberî hev di nava pevçûnekê de ne. Di vê çarçoveyê de jî, li aliyekî nîqaşên çareseriya pirsgirêka kurd a demokratîk tê meşandin û li aliyê din jî nîqaşên ku pirsgirêkê dixetimînin jî hene. Di nava van nîqaşan de divê kesên helwest û seknên wan ji hev cuda bêne dîtin û ev kesên fikrên wan cuda neyên tevlîhevkirin. Ev kesên fikrên wan cuda bêne parzinandin.

Di asta ku em ketinê de, çareseriya pirsgirêka kurd girîngiya riyên çaresekiya demokratîk bi dest xistiye. Hêzên azadî û demokrasiya kurd, di ferqa vê rastiyê de ye û li gorî vê rastiyê gavên erênî avêtine. Pêvajoya ku hate xwestin piştî hilbijartina 29'ê Adarê pêş bikeve, encama vê yekê ye û wateyek wê ya dîrokî û sîyasî heye. Gavavêtina vê pêvajoyê ya Hêza Azadî û Demokrasiyê ya Kurd, encama xwestina gelê kurd û tirk a aştî û demokrasiyê ye.

Niqaşên ku îro li Tirkiyeyê têne meşandin jî, li ser rastiya têgihiştina vê yekê pêş dikeve. Li Tirkiyeyê, li gorî berê hêjmara kesên xwedî nerîna çareseriya demokratîk e ji berê zêdetir e. Roj bi roj zêde jî dibe. Ev yek kêfxweşî dide û hêviyan zêde dike.

Dema ku mirov vê pêvajoyê bi pêvajoya borî re tîne cem hev, girîngiya vê pêvajoyê bi awayekî zelal tê xuyakirin. Kesên li Tirkiyeyê pêvajoya sîyasî û pirsgirêka kurd bi baldarî dişopînin, dê binîne ku dema li ser kurdan mijarek dihat rojevê tofan radibû. Wê demê kê ji bilî gotina fermî der barê kurdan de tiştek bigotina bi xayîntiya welat dihate sûcdarkirin. Tiştê ku anîn serê Karsaz Sakip Sabanci jî yek ji vê mînakê ye. Lê niha êdî ev qeyran ji holê rabûye. Kesên ku heta duh kurd înkar dikirin, îro hebûna kurdan qebûl dikin. Ev yek ji bo Tirkiyeyê pêşveçûnek e.

Dîsa jî ji niqaş û nerînên derdikevin holê tê xuyakirin ku hîn kesên vê pêvajoyê û çareseriya pirsgirêka kurd tehamûl nakin hene. Dixwazin pêşketina Tirkiyeyê bi paşve bikşînin. Ev helwest, bi nêzîkatî û helwesta li hemberî têkoşîna azadî û demokrasiyê ya kurd derdikeve holê. Bi vê helwesta wan tê xuyakirin ku ev kes dixwazin Tirkiyeyê dîsa ber bi rojên baş ve bibin û çareseriya pirsgirêkê bixetimînin. Ji ber vê yekê bi niqaş û nerînên xwe dixwazin pêvajoyê şolî bikin û rastiyê winda bikin. Bi vê helwesta xwe nerîna xwe ya bi benzînê diçin ser agir didin xuyakirin.

Ev derdorên dixwazin rojevê şolî bikin her roj dibin mêvanê televîzyonekê. Di bernameyên televîzyonan de dixwazin mejiyê gel şolî bikin û dixwazin alîgirên xwe zêde bikin. Ev yek jî Ergenekone tîne hişê mirovan. Kesên doza Ergenekon û belgeyên Ergenekonê temaşe kiribin, dê bibînin ku ev hêza Ergenekonê xwe di bin qilifekî din de veşartiye û bi vê şolîtiyê cewhera xwe diparêze.

Kesên hêza azadî û demokrasiya kurd red dikin, nêzîkatiya xwe ya li dijî çareseriya demokratîk didin xuyakirin. Kesên li dijî çareseriyê ku di ekranên televîzyonan de nerînê xwe tînin ziman, li dijî hêzên azadî û demokrasiya kurd dibin yek. Li dijî çareseriyê, hêza xwe dikin yek. Divê baş bê zanîn ku ev kes, di nava lîstikek pir xeternak in. Ev lîstik di dijî berjewendiyên Tirkiye û gelê Tirkiyeyê ye. Ger ku ne wisa bûya bi benzînê nediçûn ser agir. Dê li şûna biçin ser agir, piştgirî bidana aştî û çareseriya pirsgirêka kurd a demokratîk.

Dîsa her kesî dîtiye ku sedama vî şerî çiye û ji ber kîjan rastiyan pêk tê. Qebûl dikin ku ev şer ji ber sîyaseta şaş û înkarkirin û îmhaya kurdan e. Li Tirkiyeyê di vî warî de cemaweriyek bi hêz derdikeve holê. Helwesta ku ji bo şer bê rawestandin û mafê kurdan bê dayîn her ku diçe xurt dibe û tê ziman.

Niqaşên di demê dawî de li Tirkiyeyê têne kirin û helwestên di aliyê çareseriyê de zêde dibin, hêviya aştî û çareseriya demokratîk a kurd zêde dikin. Lê ev yek têrê nake. Divê helwestek hîn xurt û zelaltir derkeve holê. Pêwîst e di vî alî de gavên berbiçav bêne avêtin. Her çiqas gav têne avêtin jî dîsa kêmasiyên mezin têne jiyandin.

Ji 1'ê Hazîranê re çend roj man. Rewşa bêçalakiyê roja 1'ê Hazîranê bi dawî dibe. Hêza Azadî û Demokrasiya Kurd, bi awayekî baldar û tîtîz li gorî vê biryarê têdikoşe. Li gel van sorkirin, êrîş, operasyon, binçavkirin û girtinan, li gorî vê biryarê tevgeriyan û ev pêvajo xirab nekirin. Bi dehan caran anîn ziman ku ew di vê biryarê de bi israrin. Di vê çarçoveyê de ji bo pirsgirêka kurd bi riya aştiyane û demokratîk çareser bibe, dekleraasyonek weşandin. Lê belê li hemberî vê deklerasyonê bi operasyon û girtinan hatin pêşwazîkirin. Li hemberî van gavên aştiyane û demokratîk Tirkiye gavên erênî neavêtin. Bi awayekî êrênî bersîva vê pêvajoyê nehat dayîn.

Divê li Tirkiyeyê kesên agîgirê aştî û demokrasiyê vê rastiyê bibînin û li gorî vê yekê xwedî helwest bin. Bi nêzîkatiya 1'ê Hazîranê divê hewldana xwe ya çareseriyê zêde bikin. Divê ji Dewleta Tirk û siyasetmedarên Tirkiyeyê ji bo aştiyek mayinde û çareseriya demokratîk a pirsgirêka kurd bixwazin ku gavan bajêjin. Divê tenê ji Hêza Azadî û Demokrasiya Kurdan tenê gav avêtinê nexwazin. Divê pêvajoya borî jî li ber çavan bê girtin û bê zanîn ku gav avêtina yek alî têre nake û du alî gav bê avêtin.

Di vê çarçoveyê de divê tenê bi gotinên Serokomarê Tirkiyeyê Abdûllah Gul neyên ser û gavên berbiçav bêne avêtin. Divê gavên erênî bixwazin û ji bo gav avêtinê têkevin nava hewldan û helwestan.

Hêzên alîgirê aştî û demokrasiyê, divê ji bo çareseriya aştiyane û demokratîk a pirsgirêka kurd bibin xwedî helwest. Ger ku ev yek pêk hat, wê demê dê karibin li hemberî dijberên aştî û demokrasiyê karibin xwedî helwest û seknek xurt bin. Wê demê wê karibin bibin hêz.

## Bizmar



Adil Zozanî
a_zozani@hotmail.com

# Çekdarên me û bêwîjan

Van rojan li çiyayan bêhna bêwîjanê bilind dibe. Bêwîjan bi pelên xwe yên boz, kulîlka xwe ya ser di zinaran de dixemilîne û bi bêhna xwe serwerî jiyanê dibe.

Bêwîjan, dermanê derdan ê çiyayên Kurdistanê ye. Bi cerebeyên pîr û kalan dermanbûna bêwîjanê tekûz bûye. Lê taybetiyeke bêwîjanê heye ku ji dermanbûna wê jî wêdetir e.

Bêwîjana ku wekî miks û embera xwezayê tê zanîn, bêhnê li maran çik dike. Mar hez ji bêhna bêwîjanê nakin. Ji ber hindê ye, pîr û kalên me gotiye: **Ji ber ku mar hez ji bêwîjanê nake, bêwîjan diçe li ber kunmarê şîn dibe.**

Bi salan e, em ji bêhna bêwîjanê mehrûm bûne. Ji navê wê yê ku ji dermanbûna wê hatiye danîn, demeke dirêj e ku bêhna xwe nagihîne me. Bêhna barûtê serî ji bêhna bêwîjanê standiye. Mirin li çiyayên me hatiye ferzkirin. Tê xwestin ku em vê mirinê qebûl bikin. Bêhna bêwîjanê ya di nava xwîdanên çekdarên me de digehije deştê, tê xwestin ku veguhere bêhna xwînê.

Ji çiyayên me hinan bêhna jiyanê veguherand bêhna mirinê. Hinan jî ji bo bêhna jiyanê xwîdana xwe bi bêhna bêwîjanê şuşt û bi xemla şilêrê tilîliya serfiraziyê ber bi warên me ve anî...

Lê... yên dixwazin bi bêhna barûtê seqayê bêwîjana li ber kunmaran şînbûyî bişikênin li ser kar in. Dostaniya wan a bi xwezayê destebiratiya bi mar re heye.

Ew jî hez ji bêhna bêwîjanê nakin. Dixwazin bêhna barût û mirinê serwer bibe. Dema bêhna bêwîjanê û bêhna nanê tenûrê bûn yek. Dema di qazan û mencelan de bîk û mendê hatin kelandin û hûrkê penîrê salê di nav de hate werkirin. Dema ji çîlê heliz û çevirê soxetan hate çêkirin û di kanîsarkên welat de hatin parastin dê dostebiratiya mar û barûtê bi dawî bibe. Yên ku naxwazin ev destebiratî bi dawî bibe, li ser bedelên me dixwazin pêşerojekê ji bo xwe ava bikin. Lê, ew ên dixwazin bi bêhna barûtê cisaretê bidin maran ku ji kunmarê derbikevin, nizanin ku bêwîjan nebateke çiyayî ya sê demsalan e. Xwe nû dike. Bêhna xwe di nava baskên rojê yên ên biharî de diparêze û heta payîzê serwer dike.

Bêwîjan xwe nû dike. Destebirayên mar jî xwe li benda germa havînê digirin. Mar hej ji kelegerma havînê dikin. Xasima Koremar. Darbestên çekdarên me yên ku di vê demsalê de tên, birînên wan ji gezkirina Koremar in. Ji bo ku bêhna bêwîjanê seh bikin, milê xwe bidin bin darbesta wan.

Cenazeyên çekdarên me bêhna bêwîjanê hembêz dikin... Herî dawî, **Elî Gever, Berîtan Hêvî,Sema Sêrtî û Rustem Rojhilat** di hembêza xwe de bêhna bêwîjanê anî. Çend rojan beriya niha jî hinên din anî bû. Çekdarên me yên bûne cangoriyên bêhna bêwîjanê, bi hêviya jiyaneke serfiraz baskên xwe li ber semayan vekirin. Hê jî bedel ji çekdarên me tê xwestin. Bedel ji me tê xwestin. Ji bo ku bikaribin Koremarên di kunmaran de ji aliyê bêwîjanê ve ketine mehserê serbest bikin û pirtir bikaribin jiyanê gez bikin, bedel ji me tê xwestin.

Bedela me jî çekdarên me ne. Lê nabe. Em bêhna bêwîjanê li ser darbestê di hembêza şehîdan de naxwazin. Bêhna bêwîjanê ya di zinaran de daîmî bibe, dê bibe nîşaneya jiyaneke serfiraz. Her darbestek vê rastiyê dike xilweya ber guhên me. Êdî bedelên ji me nexwazin...

Bila bêhna bêwîjanê dîsa li çiyayan serwer bike. Heke mar dimire jî bila bimire. **Em xemxurên mar nîn in, behîvanên bêhna bêwîjanê ne...**

# Edalet çi ye û çi nîn e

MAZHAR AKTAŞ

*Çi tiştên derew bînî, tu dûrî here; Were, em bi hev re herin pêş, were!*
*Çi tiştê neqenc bî, şerê wî bike; Heçî qenc e her dem tu her wî bike.* **(Cegerxwîn)**

Wateya EDALET'ê li gorî ferhengan; pergalek e,wekheviyek e, weke rastiyê biryardayîn e, şopandina riya rast e û hwd. in. Edalet, encama lihevkirina emelên dilpakî û exlaqî ne. Ji Eflatûn û vir ve, nêrîna li ser edaletê tê pejirandin jî, hêza zanyariya nefsa mirovan e, hêza hêrsê û hêza şehwetê ye. Ev her sê hêz, bi mirovan re sê dilpakiyan diafirîne; Bi zanayî, lehengî û namûs ku ev rengdêrên mirovan in. Bi van her sê fazîletan ku tên ba hev, edalet pêk tê. Mirovên xwedî ramanên zanayî û di her warê jiyanê de lehengî û hakimê nefsa xwe be, bê şik û guman, ew ê tevger û biryarên wan bi edalet bin.

Du biwêj bi EDALET'ê ve têkildar in; a yekemîn hindazetî (îtîdal) û biwêja duyemîn jî wekhevî ye. Hindazetî, weke demsala biharê, divê weke mêzînê be. Bi awayekî weke şev û rojê be; weke serma û germê be; weke mirin û jiyanê be; weke ronahî û tarîtiyê, divê bi mêzîn be. Biwêja wekheviyê jî, tiştê ku tê dayîn û yê heq dibe, wekheviya wan îfade dike. Di jiyana kesayetî û civakî de, peywira herî zor û bi zehmet di her demê de, pêkanîna EDALET'ê bûye. Edalet ne karê mirovên tirsonek û erzan e. Mirovê ku dengê du şîlmaqan hat, rahişt kumê xwe û reviya nikare edaletê pêk bîne, heger ew kes serokomar be jî.

Pêkanîna edaletê ne hêsan bûye, lewma Xwedayê alemê wisa ferman daye: (Bêguman XWEDA, emrê bi edaletî-wekhevî û qencîkarî û alîkariya merivên xwe yên nêz dike û emrê bi xwe dûriya ji nepakiyan, nebaşiyan û neheqiyê dike. Ew li we şîretan dike, hêvî heye ku hûn bifikirin-şîretan bigirin.) Suretê Nehl, ayeta 90'î.

Pêxemberê Xweda jî, girîngiya edaletê wisa aniye ziman:(Saetek bi edalet, şûna îbadeta nafîle* ya heftê salî digire.)

Weke tê zanîn, Nuşîrewan bi edaleta xwe nav û deng daye. Her çiqas Nuşîrewan mirovekî ne misilman bûye jî (zerdeştî bû). Pêxember gotiye ku; ji ber edaleta wî, Xweda ji wî re li wê cîhanê, cihekî taybet çêkiriye.

Di dema xelîfê îslamê Hz.Omer de, misilmanan li ser zeviya cihûyekî mizgeft ava kiribû. Bêyî ku destûrê ji wî bixwazin. Gava mirovê cihû dibîne li ser zeviya wî mizgeft hatiye avakirin, diçe giliyê wan kesan dike. Kesên ku mizgeft ava kirine dixwazin wî razî bikin, lê ew diçe ba Hz.Omer giliyê xwe dike. Hz.Omer biryareke balkêş û dîrokî dide: (Mizgeftê hilweşînin, ez nikarim edaletê xera bikim.) Belê mizgeft ji nû ve ava dibe, lê ku edalet ji riya xwe derket yanî xera bû, serastkirina wê pir û pir zehmet e. Hozan Namik Kemal jî wisa gotibû (Ger ku edalet di nav milet de winda bibe, îtîbara dewletê ger bigihêje ezmanê jorîn jî, wê rojekê têkeve bin erdê.)

Ger bi edalet tevgeriya ba; kanî ew împeratoriya ku roj li ser nediçû ava?

Kanî Yekîtiya Sovyetan, ku Asya û parzemîna Ewropayê di bin bandora wê de bû?

Kanî Împeratoriya Osmanî, ku parzemîna Asyayê û Efrîkayê heta nava Ewropayê, di bin lingên hespê wan de dihejiya?

Bêguman, têkçûn û hilweşandina wan împeratoriyan ji ber windabûna edaletê di nava wan de bû. Ma edalet ew e, ji ber dizîna du kîlo peqlawe, duwanzde sal ceza li zarokekî bê dayîn? An jî, ji bo avêtina kevirekî, bi dehan sal cezayê girtîgehê li zarokê kurdan bê birîn. Li hêlekê TRT 6, bîst û çar saetan weşana bi kurdî dike, lê gava Gun Tv çend hevokan bi kurdî dike, duwanzde rojan tê girtin. Zilm û zora li ser zimanê kurdî hê jî berdewam e. Mehekê girtina Azadiya Welat, çiqasî hiqûqî ye û bi edalet e?

Nuşîrewan, bi kirin û biryarên xwe yên adîlane, bû Nuşîrewanê Adil. Ger bi gotin an jî bi navlêkirinê ba, beriya AKP'ê, Partiya Edaletê (AP) hebû, lê ji bilî edaletê hemû kiryarên xerab û nebaş, di dema desthilatdariya wê de derketin holê.

Madem mirin heye, jiyana bêedaletî ji çi re ye! Bi navlêkirin û yasayan, edalet pêk nayê. Edaleta mezin, a ku di wijdanê civakê de cih girtibe, ew bi xwe ye.

Tu bi xêr hatî Hawar, hêvîdar im ku roja te tarî nebe, her dem ronahî be.



***îbadeta nafîle:*** Îbadeta bi şevê, piştî nimêja eşa, heta nîvê şevê

*Kongre İlanı*

***DTP Sur İlçe Örgütü 1. Olağan Kongresi 12.06.2009 Cuma günü sabah saat: 10.00'da Sur İlçe Örgütü binasında tüm halkımız davetlidir.***

1- Açılış - Yoklama
2- Divan Seçimi
3- Saygı Duruşu
4- Faaliyet Raporu
5- Mali Rapor
6- Dilek - Temenniler
7- Seçim
8-Kapanış

*DTP Sur İlçe Örgütü*

**HAWAR**
**Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.**
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
**Bedri ADANIR**
***Adres:***
Kooperatif Mahallesi Gevran Caddesi 1 Geçit. Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis Yenişehir - Diyarbakır
***TEL:*** 0 (412) 229 00 30
***Fax:*** 0 (412) 229 00 39

Baskı ***(ÇAP):***
***Stenbol:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
***Tel:*** 0 (212) 580 63 80
***Edene:*** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstîklal. Cad. ***No:*** 44 Seyhan Edene
**Yayın Türü:** Süreli

www.arsivakurd.org

# 50 hezar kurdî cenazê xwe rakir



Li navçeya Gever, Şemzînan, Sêrt, Patnos û Melezgirê kurdistanî bi girseyî xwedî li cenazeyên gerîlayên xwe derketin û bi tenê li Geverê 50 hezar geverî di merasîma cenazeyê endamê HPG'ê Alî Îhsan Îke (Alî Gever) de bû. Esnafê navçeyê jî dikanên xwe venekirin.

***GEVER:*** Cenazeyê Endamê HPG'ê Alî Îhsan Îke (Alî Gever) ê di 22 gulanê de di pevçûna li navçeya Liceyê de jiyana xwe ji dest dabû, ji aliyê malbata wî ve hate girtin û anîn navçeya Geverê ya Colemêrgê. Li navçeya ku dikandaran dikanên xwe venekirin, malbatê cenaze anî Taxa Yeşîldere. Ligel ku malbatê xwest cenaze li vir veşêre jî girseya bi qasî 50 hezarî ber bi navenda navçeyê ve dest bi meşê kir. Girseya piraniya rûyê wan girtiye, wêneyên endamên HPG'ê hildan. Dema girse hate navenda navçeyê leşkeran xwe da paş û li derdora saziyên dewletê tedbîrên berfireh hatin girtin. Ji ber meşê riya Wan û Colemêrgê ji trafîkê re hate girtin. Girse ber bi Qada Azadiyê meşiya.

***ŞEMZÎNAN :*** Cenazeyê Endama HPG'ê Leyla Şavli (Bêrîtan) a li navçeya Liceyê di 22'ê gulanê de bi 4 endamên HPG'ê re jiyana xwe ji dest dabû, ji Licê anîn navçeya Geverê û ji vir jî malbatê cenaze bir navçeya Şemzînanê. Cenazeyê Şavlî li daketina gundê Şapatayê ji aliyê bi hezaran kesên di nav de Şaredarê Şemzînanê Sedat Tore, Serokê Rêxistina DTP'ê Emrullah Ozturk, Endamê PM'ê yê DTP'ê Emîn Sari, Şaredarê Şemzînanê yê berê Hurşît Tekîn jî heyî ve hate pêşwazîkirin. Piştî pêşwazîkirinê cenaze birin gundê Garê.

***PATNOS:*** Di pevçûna 23'yê gulanê li çoltera gundê Betalgaziya Melazgira Mûşê de endamê HPG'ê Ugur Tayfur (Çekdar Xartawîn) jiyana xwe ji dest dabû. Malbata Ugur cenazeyê kurê xwe ji ıexweşxaneya dewletê ya Meletiyê wergirt. Cenazeyê Ugur li daketina navçeya Mezgira Mûşê ji aliyê konvoya bi sedan kesî ve hate pêşwazîkirin. Piştre cenaze bi konvoyeke mezin ber bi gundê Burnubulaka Navçeya Patnosa Agiriyê ve derxistin rê û bi dirûşman defin kir.

**AGIRÎ- COLEMÊRG / DÎHA**

# Li Kurdistanê sûcê şer pir kûr e

## Ji vir 14 sal berê leşker û cerdevan li Midyadê di bin çavan de li ber çavên Mecît Aydin tecawizî bûka wî Ş.A'yê dikin, rojek piştî derketinê bûk û rojek piştî bûkê jî Mecît Aydin întihar kirin

**FATMA KOÇAK / HAŞÎM ABAK** / MÊRDÎN/ DÎHA

Jina bi navê Ş. A. ku bi bapîrê hevserê xwe Mecît Aydin re hate binçavkirin hat angaştin piştî birin qereqolê rastî tecawiza leşker û cerdevanan hat. Derket holê ku Ş. A. piştî li ber çavê bapîrê hevserê xwe rastî tecawizê hat, roja derketî xwe kuştiye. Malbata Aydin piştî 14 salan der barê leşker û cerdevanan ku yek jê endamê meclîsa şaredariyê yê AKP'ê ye de gilî kir.

Bûyerên tecawizê yên hovane yekem car di sala 2002'yan de jina bi navê Ş. E. di panela li Kolna Almanyayê pêk hatî de diyar kir ku di 1993-1994'an de li navçeyên Şemrex û Dêrikê yên Mêrdînê gelek caran rastî tecawiza leşker û cerdevanan hatiye. Li ser vê li 50 leşkeran doz hat vekirin lê dedgehê ew beraet kirin. Piştî vê têkçûna exlaqî ya leşker û cerdevanan, bûyerek heman cardin li Midyadê derket holê. Ş. A. jî di sala 1995'an de bi bapîrê hevserê xwe Mecît Aydin re hate binçavkirin.

**Piştî hatin berdan întihar kirin**

Li gorî agahiyan birîndar dikeve destê leşkeran û leşker û cerdevan di 19'ê îlona 1995'an de bi ser mala malbata Aydin de digirin. Ji bo ku bavê wî Faris Aydin ne li mal e kalê wî Mecît Aydin (66) û dayika 3 zarokan Ş. A. hildide binçavan. Li gorî angaştê Ş. A. û Mecît Aydin hefteyekê di bin çavan de tên hiştin û di midûryeta polîsan a Midyadê de li ber çavê xezûrê Ş. A'yê leşker û cerdevan tecawizî wê dikin. Piştî ku ew tên berdan rojek li derve dimîne û roja 27'ê îlonê Ş. A û rojek piştî wê jî xezûrê wî Mecît Aydin întihar dikin. Li ser vê malbat koçî Amed û Îspartayê dikin.

**'Bavê min û bûka min girtin'**

Faris Aydin bal kişand ser mijarê û wiha got: "Ez naxwazim êdî ev bûyer veşartî bimîne. Bila êdî her kes vê êşa me bizane û bila kesên ev hovîtî kirin, bên darizandin. Ez kal bûme, bi salan e tedawiya psîkolojîk dibînim. Ez nikarim êdî vî barî rakim. Ez dê der barê 15 cerdevan û leşkerên wê demê li Qereqola Cendirmeyan a Midyadê wezîfe dikirin de giliyê bikim. Ev tiştên li me kirîn sûcê mirovahiyê ye."

**Derfet nebû ez alîkarî bikim**

Dayîka Ş. A. ya bi navê M. E. diyar kir ku keça wê tiştên di bin çavan de lê hatine kirin ji wê re gotine û ev tişt anîn ziman: "Keça min navê hin cerdevanên tecawizî wê kirîn, ji min re gotin. Ew hê jî li ser wezîfeyê ne. Piştî Ş. A. întihar kir, dilê hevserê min rawestiya û jiyana xwe ji dest da. Bi salan e kezeba min dişewite ku min nekarî ez alîkariya keça xwe bikim."

**Navê tecawizkaran aşkera kir**


Şahidên bûyerê ku nexwestin navê xwe bidin diyar kirin ku Yusuf Taş (Kor Yusuf), Kadrî Dag, Nedîm Yusuf Neso kesek bi qoda Feyzî Botî tê zanîn tev li bûyera tecawizê bûne.

**Tecawizkar encumenê AKP'ê ye**

Hate zanîn ku Nedîm Yusuf Neso yê tê diyarkirin beşdarî tecawizê bûye di 29'ê adarê de wekî endamê meclisê yê AKP'ê hatiye hilbijartin û hêj sercerdevaniyê dike. Botî 7 meh berî niha jî bi boneya zorê ketiye malekê û jinek tacîz kiriye bibû nûçe.

**Keskîn: Tecawiz rêbazeke şer e**

Parêzera Buroya Alîkariya Hiqûqê ya bi Kesên di Binçavan de Rastî Tacîz û Tecawizê Tên Eren Keskîn, diyar kir ku îşkenceya zayendî cureya îşkenceyê ya herî zor tê gotin e. Kesîn diyar kir ku şerm, tirs, pîvanên civakê yên feodal, hişmendiya zilamî û mîlîter destûr nade ku ev tacîz û tecawiz derkevin holê. Keskîn wiha axivî: " Di şerê li Kurdistanê de sûcê şer pêk hatî û cinsî wek rêbaza şer hat bikaranîn. Piraniya jinên serî li buroya me didin jinên kurd in."



Faris Aydin

# Cerdevan ji kuştinê têr nabin

Piştî komkujiya Zanqirtê ya cerdevanan, nîqaşên têkildarî karên qirêj ên cerdevanan ji berdewam dikin. Li gundê Dêrkfana Kercewsa Êlihê ji cerdevan Abdulkerîm Orak, dayîka 3 zarokan Mencê (33) û bavê wê Osman Orak (76) qetil kirin.

Hate zanîn ku Abdulkerîm Orak piştî 2 kes kuştî bi gotina, "Ez heta çend li vir jî weki Zanqirtê nekim teslîm nabim " gef xwarine. Gundiyan daxuyand ku ligel hefteyek di ser bûyerê de derbas bûye cerdevan hêj nehatiye girtin. Gundiyan bal kişand ser felaketa cerdevaniyê û xwestin dawî li vê şebekeya kuştinê bê. Birê Mencê Orak, Omer Orak bûyer ji DÎHA'yê re vegotin.

**'8 salan bi hev nekirin'**

Omer Orak bal kişand ser zewicandina xwîşka xwe Mencê Orak û wiha axivî: "Di sala 1993'yan de Mencê û Eyup Orak zewicîn. Piştre Eyup Orak hewî bi ser xwîşka min de anî. Li ser vê 8 sal di nav wan de nîqaş dom kir. 4 meh berî niha ji hev veqetiyan. Jixwe zarok jî man cem bavê xwe. Lê ew li gundê Dêrkfanê yê bavê min lê dimîne, dijîn." Orak anî ziman ku xwîşka wî piştre bi Mecdîn Akyuz ê ji gundê Hêştireka re dizewice.

**Alîkariya bavê xwe dikir**

Birayê Orak, destnîşan kir ku xwîşka wî Mencê ji bo alîkariya bavê xwe çûye gundê Dêrkfanê û wiha dom kir: "Xwîşka min êdî ji wan veqetiyabû û tu têkiliya me bi wan re nemabû. Ji bo alîkariya dirûna giya bavê min gazî xwîşka min kiribû. Zeviyên me û Abdulkerîm Orak kêleka hev in. Di dema dirûna giya de Mencê, dayika min, bavê min û xwîşkek min ya din li wir bûn. Lê Abdulkerîm berî wan vedigere malê. Bavê min hinek zû tê malê."

**Xwîşka min da ber gulan**

Orak, derbirî ku xwîşka wî Mencê, dayîka wî û xwîşkek wî ya din bi hev re tên malê û wiha derbirî: "Dema dayîk û xwîşkên min tên gund Abdulkerîm ji hewşê derdikeve û xwîşka min gulebaran dike. Xwîşka min dikeve û jiyana xwe ji dest dide. Dayik û xwîşka min a din ji tirsan direvin û agahî didin bavê min. Dema bavê min tê xwîşka min li erdê dibîne. Vê carê guleyan berdide bavê min min wî jî dikuje."

**Dê em tev bikuştana**

Orak got ev yek jî wek komkujiya Şemrexê ye û sedem jî pergala cerdevaniyê ye. Orak diyar kir ku heke li ser zeviyê di destê Abdulkerîm de çek hebûna dikaribû wan li wir bikuje sûc bavêje ser hin kesên din. Orak vegot ku Abdulkerîm ji cerdevanekî teqawît e bi çeka xwe ya dema cerdevaniyê bavê wî û xwîşka wî qetil kirine û wiha pê de çû: "Cerdevanî hêzê dide kesan û vê hêzê di rewşên xetere de bi kar tînin.

**'Gefa tevkujiya Zanqirtê xwar'**

Abdulkerîm Orak ku piştî bûyerê reviya, hîn jî nehatiye girtin. Şahidên bûyerê yên nexwestin navê xwe diyar bikin, dan zanîn Abdulkerîm Orak di dema bûyerê de gotiye "Ez dê vir bikim wekî Zanqirtê û heta ji Zanqirtê jî xirabtir bikim." Hat gotin ku kuştina mirovan ji bo cerdevanan ewqas hêsan bûye. Ev ji ber çiye? Hêz hêza dewletê ye. Divê di demeke zûtir de ev pergal ji holê rabe. **MÊRDÎN / DÎHA**

# Ligel rapora bijîşk jî tedawiya wê nakin

Malbata Ocal ku ji neçarî ji Bedlîsê koçî Edeneyê kiriye, zarokên wan ên bi navê Mahsum û Hediye yên bi nexweşiya helîna hestî nayên dermankirin. Xwîşk û birayên ku heta demekê li Nexweşxaneya Fakulteya Tipê ya Zanîngeha Çukurova ya Balcaliyê hatin tedawîkirin, tevî ku ji aliyê serbijîşkê nexweşxaneyê ve rapora, "Heta salekê derbasdar e. Dermankirina wan gelekî girîng e. Her ji 3 mehan carekê divî bên kontrolê" girtin jî, dîsa ji aliyê heman nexweşxaneyê ve ev 9 meh in bi hinceta "Cihê vala tuneye" paş ve tên vegerandin.

Rewşa malbata Ocal ku di sala 1988'an de ji ber pêkutiya cerdevaniyê ji navçeya Hîzan a Bedlîsê kocî Edeneyê kirin zehmetiyên mexdûrên koçberiyê dikişînin careke din derxist ber çavan. Fîkrî Ocal ku ji ber di karên giran de xebitiye pişta wî ketiye ber û hevsera wî Hamrî Ocal ku ji sedî 49 çavên wê nabînin, zarokên wan ên bi navê Hîdayet (11) û Mahsum Ocal (10) ji zaroktiya xwe ve nexweşiya helîna hestî (Osteoporoz) li wan peyda bû. Piştî ku nexweşiya Mahsum û Hidayet giran bû malbata Ocal, çû Nexweşxaneya Balcali ya Fakulteya Tipê ya Zanîngeha Çukurovayê û zarokên xwe ji bo dermankirinê li nexwşxaneyê dan razandin. Lê ev 9 meh in malbata Ocal ji aliyê rayedarên nexweşxaneyê ve bi hinceta "cihê vala tuneye" paşda tên vegerandin. Dayika zarokan Hamrî û bavê zarokan Fîkrî Ocal xwestin ku alîkariya wan bê kirin.



**EDENE / DÎHA**

## Ji ber meşa Amarayê 9 kes girtin

**RIHA**

Doh li Rihayê di serdagirtina malan de 9 kes hatin binçavkirin Yekîneyên Midûriyeta Polîsan a Rihayê di encama serdagirtina malan de Avnî Bînîcî, Hasan Sutpak, Osman Çîçek û Hîdayet Demîr ji navendê, Xebat Mînkara û Emîne Yildiz jî ji Sêwerekê binçav kiribûn. Di saetên nîvro de ji li navenda bajar Abdurrahman Elmassan û li Serêkaniyê jî Dilgeş Bozkurt û Valah Îlhan hatin binçavkirin. Bi van kesan hejmara binçavkiriyan derket 9 kesan.

## Ji ber axaftina kurdî Baydemîr îfade da

**AMED**

Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr di çarçoveya doza ku ji ber axaftina xwe ya di dema hilbijartinan de di bernameya Gun TV'yê de bi kurdî kirî, lê hatiye vekirin li Dozgeriya Komarê ya Amedê îfade da. Baydemîr di îfadeya xwe de axaftina xwe parast û diyar kir ku kurdî dewlemendiya Tirkiyeyê ye û ew dê li hemû qadên jiyana xwe de kurdî bi kar bîne. Baydemîr, desnîşan kir ku kanala TRT ya kurdî weşana bêyî nivîs dike û tiştek nabe. Baydemîr, pirsî ku gelo çima dema TV'ên din weşana bi vî rengî dike tê girtin? Em çima ji ber vê weşanê û axaftina kurdî ku dewlemendiya wî welatî ye tên darizandin.

## 10 YDG-M'yî hatin binçavkirin

**ANTALYA**

Di encama serdagirtinên malan ên li Antalyayê pêk hatin de 10 endamên YDG-M'ê hatin binçavkirin. Yekîneyên Midûriyeta Polîsan a Antalyayê di saetên serê sibê de li taxên Şafak, Varsak û Larayê bi ser gelek malan de girtin. Hate zanîn ku di encama serdagirtina hevdem a 6 malan de endamên Meclisa Ciwanên Demokratîk û Welatparêz (YDG-M) û xwendekarên Zanîngeha Akdenîzê K.I, Y.A, R.K, M.C, Ş.C, B.O û 4 kesên navên wan nehatin zanîn, hatin binçavkirin. Hate zanîn ku 10 kes bi hinceta di Cejna 1'ê Gulanê de sloganên, "Derzgonî avêtine" hatin binçavkirin. YDG-M'yî li Midûriyeta Polîsan a Antalyayê tên girtin.

## Li Êlihê 24 kes hatin girtin

**ELÎH**

Li Êlihê û navçeyên wê 30 kesên di encama operasyona li hemberî 16 navendên rehabîlîtasyonê de hatin girtin, piştî pirsyarkirina li Midûriyeta Polîsan a Êlihê sewqî Dozgeriya Komarê hatin kirin. Ji 30 kesên bi daxwaza girtinê sewqî dadgehê bûn 24 kes bi bi hinceta qezenca neheq bi dest xistine, di ewraqan de sextekarî kirine hatin girtin. 6 kes jî li ber esasê daraza bêyî girtinê hatin berdan.

www.arsivakurdi.org




# Karayilan: Çare 'Parlamentoya Kurdistanê' ye

**I BEDRAN DENÎZ** BRUKSEL / ANF

Rojnameya îngilîz The Times hevpeyvîneke bi Serokê Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê (KCK) Murat Karayilan re hatiye çêkirin weşand. Tîmes di şîroveya xwe de anî ziman ku 'PKK'ê nûbûnên bi têkiliyên Tirkiye-Iraqê re baş şîrove kirine'.

Hevpeyvîna Nûçegihanê The Timesê Anthony Loyd li çiyayê Qendîlê bi Karayilan re çêkirî deng veda. Karayilan di vê hevpeyvînê de pêvajoya bêçalakîbûnê ya ku heta 1'ê Hezîranê dom bike nirxand. Karayilan di hevpeyvînê de peyamên ji bo çareseriyeke demokratîk û aştiyane dan û anî ziman ku gelê kurd domkirina şer naxwaze. Karayilan wiha got: "Em bawerin bêyî zêdetir xwîn bê rijandin pirsgirêk çareser bibe. Em di nava sînorên Tirkiyeyê de çareseriyeke demokratîk dixwazin."

**Mînaka Îskoçya û Îrlandayê**

Karayilan di hevdîtina xwe de bal kişand ser modela Îskoçya û Îrlandayê û got: "Îngilistanê parlamentoya Îskoçyayê daye û îradeya îskoçan qebûl kir. Em jî ji Tirkiyeyê heman tiştî dixwazin." Karayilan anî ziman ku ew ji tecrûbeyên cîhanê sûdê digirin û bi kesên pêvajoya Îrlandayê jiyane re diyalogê datînin.

**'PKK'ê pêvajo rast nirxandiye'**

Timesê di nirxandina xwe de diyar kir ku tevgera kurd bi helwesta xwe dawî mercên herêmî baş nirxandine. Di şîroveyê de ev agahî hatin dayin: "Ev helwest rastî pêvajoyeke krîtîk hat. Serok Obama jî difikire ku Tirkiyeyeke ku têkiliyên wê bi kurdan û Iraqê re baş, dê derfeta bi rehetî vekişandina leşkerên xwe ji Iraqê pêk bîne."

**Bi hezaran gund wêran kirin**

Rojnameyê diyar kir ku ligel destpêkirina têkoşîna çekdarî ya PKK'ê, dewleta tirk bi awayekî hovane bi hezaran gundên kurdan wêran kirine. Li hemberî vê reaksiyona dewleta tirk, PKK'ê bi rêbazên gerîla bersiv daye. Di hevpeyvînê de gotinên Karayilan ên der barê pasîfkirina 6 hezar gerîlayan ku di pozîsyona xweparastina rewa de ne hatine dayîn û bi bîr xist ku heta 1'ê Hezîranê bendewariya ji bo bersiva dewleta tirk heye.

Rojnameyê gotinên Karayilan ên der barê efûyeke giştî de derxistine pêş û diyar kiriye ku Karayilan gotinên xwe yên ji bo efûyeke giştî bi îtina hilbijartine û ev gotinên Karayilan ragihandin: "Ev şerek bû. Hem tirkan û hem kurdan zirar dît. Divê her tu civak jî efûkirina hev bizanibin. Divê her kes beşdarî vê pêvajoyê bibe. Rêberê me Ocalan jî. Efû ji bo aştiyê şertek e. Divê kurd û tirk rûpeleke nû vekin."

**'Nijadperest ji çareseriyê dûr in'**

Karayilan di hevpeyvîna xwe de diyar kir ku KCK'ê destê aştiyê direjî Tirkiyeyê kiriye û lê hêj ev pêşniyarên wan tên nîqaşkirin. Karayilan got ku nijadperest pêşniyarên PKK'ê red dikin û artêş jî bi zêdekirina operasyonan bersivê dide. Rojnameyê binê van gotinên Karayilan bi xetên qalind  xêz kirine: "Em di duryanekê de ne. Divê Tirkiye ji du riyan yekê hilbijêre. Heke Tirkiye pêşniyarên me qebûl neke û êrîşên xwe zêde bike, normal e ku em jî bi her awayî xwe biparêzin. Û çalakiyên bersivdayinê pêk bînin. Çiqas bibêjin 'terorîst', li Tirkiyeyê divê PKK mîna parçeyekî esasî yê pirsgirêka kurd bê qebûlkirin."

# 'Bersivê bidin biryara bêçalaktiyê'

Ji saziyên li Amedê, Platforma Şaxên KESK'ê, DTP û hunermendan bal kişandin ser biryara bêçalaktiyê ya KCK'ê ya heta 1'ê hezîranê û xwestin ku dewlet gavan bavêje.

Platforma Şaxên KESK'ê, DTP û hunermendên li Amedê bang li dewletê kir û xwestin ku gavan bavêje. Hunermendê Navenda Çandê ya Dîcle Firatê Farqîn diyar kir 20 sal in êşên li herêmê tên kişandin bi hunera xwe bi gel re parve dike û wiha got: "Em naxwazin şer zêde bibe. Ji bo vê yekê heta 1'ê hezîranê lazim e bersiva biryara bêçalaktiyê bê dayîn. Lê operasyon û polîtîkayên dewletê wisa nîşan dide ku dixwazin cardin vegerin salên 1990'an."

**'Aştiyê asteng dikin'**

Mamosteyê Erbanê Şêrko jî bal kişand ser zêdekirina operasyonan a ligel biryara bêçalaktiyê ya KCK'ê û ev tişt gotin: "Her roj operasyon tên kirin û pevçûn derdikevin. Şervan û leşker jiyana xwe ji dest didin. Lazim e rewşenbîr, hunermend û gelê tirk jî rabe ser piyan. Divê gelê kurd û tirk bi hev re bêje êdî bes e." Hîndekarê Şanoyê Osman  Xunav, wiha axivî: "Ev du meh in agirbest hatiye îlankirin lê her roj cenazeyên gerîlayan tên."

Endamê PM'a DTP'ê Cemal Coşkun, daxuyand ku eger dewlet bersiv nede agirbesta PKK'ê ya heta 1'ê hezîranê tiştek ji destê wan nayê. Coşkun, diyar kir ku nabe ji PKK'ê re bêjin agirbestê dirêj bike û got ku wekî Hevseroka wan Emîne Ayna jî gotiye, ji PKK'ê re nabêjin 'Agirbestê dirêj bikin'."

**'Agirbesta dualî'**

Berdevkê Demî yê KESK'ê yê Amedê Ramazan Çetînkaya, bal kişande ser zirarên ku ev 30 sal in ji ber pevçûnan rûdane û got ku heta niha ji ber şerî bi hezaran kesan jiyana xwe ji dest da û gelek zirarên madî jî derketine holê. Çetînkaya wiha axivî: "Ji bo ku ev hewayê bi hêvî bidome pêwîst e agirbest bibe dualî." Çetînkaya, diyar kir êdî lazim e ev pirsgirêk bi riyên demokratîk were çareserkirin û got ku ew wekî KESK'ê xwedî hêvî ne. **AMED / DÎHA**

# Turk banga bêçalakîtiyê ya dualî kir

## Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk di civîna koma partiyê ya parlamentoyê de axivî û bang li Hikûmeta AKP'ê kir ku bi lezgînî dawî li operasyonan bîne. Turk li ser vexwandina dozgeriyê jî rawestiya û got: 'Em îfadeyan nadin'

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk ku di civîna koma partiyê de axivî balkişnad ser nîqaşên çareseriya pirsgirêka kurd. Turk nîqaşên tên kirin erênî nirxandin û wiha got: "Ku wekî tê îdîakirin di navbera saziyan de mutabakatek hebe hingê lazim e hikûmet derbasî pêvajoya bêçalaktiyê bibe. Wezîfeya Hikûmetê ya sereke ew e ku PKK'ê di çarçoveya biryara bêçalaktiyê de bihêl." Turk li ser dozên derbarê wan de jî daxuyand ku îfade nadin.

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk balkişand ser nîqaşên demên dawî di warê çareseriya pirsgirêka kurd de tên meşandin jî û ev tişt gotin: "Gel biryara xwe daye. Gel azadî, demokrasî, aştî û edaletê dixwaze. Li vir wezîfe dikeve berê Meclisê. Lazim e Meclis Makeqanûnek beşdarker, demokratîk, ji navendîbûnê dûr, cudahiya rêvebirin, zagonsazî û dadazê li ber çavan digire çê bike."

**'Dewlet di asta biryardayînê de ye'**

Turk diyar kir ku xebatên di vî warî de dê karektera dewletê ya otorîter-zordar vegerîne krekterek demokratîk. Turk diyar kir ku PKK'ê di vî warî de riya aştiyê vekiriye û wiha pêde çû: "Li hemberî veguherîna demokratîk a Tirkiyeyê astenga herî mezin neçareserkirina pirsgirêka kurd e. Zêdeyî 25 salan e polîtîkayên leşkerî-şidet û asîmîlasyonê tên meşandin. Lê em lê dinêrin welat winda kiriye. Encama vê polîtîkaya înkarê tune ye. Hikûmetê û serê dewletê çareseriya pirsgirêka kurd wekî pirsgirêka herî girîng aniye ziman. PKK'ê bi biryara bêçalaktiyê şansek daye aştiyê û derî vekiriye. Çareserî êdî nayê taloq kirin."

Li ser mijarê Turk diyar kir ku pêvajoya pevçûnê wan dixe nav fikaran û wiha domand: "Bi operasyonên li herêmê tên zêdekirin me dixin nav fikaran. Hind derdor dixwazin cardin vegerên pêvajoya bi pevçûn." Turk gotinên Cîgirê Serokwezîr Bulent Arinç ên wekî, "Ji bo çareseriyê di destê me de tiştek tune ye" jî bi bîrxist û wiha pêde çû: "Ku rewş wisa be, mixabin rojên xirab li pêşiya Tirkiyeyê ne û tiştên baş na yên xirab dê çê bibin. Ev rewşek bi fikar e. Di demek ev pêşveçûn çêdibin de amadekariya hikûmetê tune ye."

Turk diyar kir hişmendiya Ergenekonê muxataban ji holê radike û şer zêde dike û wiha axivî: "Lazim e hikûmet nîşan bide ku ji vê hişmendiyê cuda ye. Serokwezîr di 2005'an de li Şemzînanê teslîmî hind hêzan bû û pêvajo xitimî. Hêviya me ew e ku cardin Erdogan nekeve xetaya di 2005'an de kirî. Wezîfeya hikûmetê ya herî acîl ew e ku PKK'ê di çarçoveya bêçalaktiyê di bigire. Lazim e metirsiyên xwe yên siyasî danê aliyekê. Li Tirkiyeyê kin dirêj dê pêvajoyek aştiyê dest pê bike. CHP'ê di salên 89-90'an de raporên pirsgirêka kurd ên berfireh amade dikirin."

**'Em ji bedeldayînê natirsin'**

Turk, bal kişand ser operasyona piştî hilbijartina herêmî li hemberî DTP'ê hatiye destpêkirin û wiha got: "Xeta partiya me ya siyaseta demokratîk tê darizandin. Bedêla wê çi dibe bila bibe em bi tu awayî dest ji ve doza xwe bernadin. Eger me paş ve av bavêta, di serî de me ev kincê ji agir li xwe nedikir!" Turk ku da zanîn hewl tê dayîn pêkutiyan bigihînin parlamenterên DTP'ê jî, bi bîr xist ku ji bo îfadeyê bang li parlamenterên wan hatiye kirin.

**'Em îfadeyan nadin'**

Turk, da zanîn ku di binê vê darizandinê de hikûmet heye û wiha pê de çû: "Çi heyfe ku partiyek desthilatdariyê ya ew bi xwe jî mexdûrê darazê ye, pêkanînên ku ew bi xwe pê re rû bi rû maye niha li hemberî muxalefeta dixe dewrê. Sedemê vê qrîzê ne em in. Ji ber vê yekê ji bo em nebin hevparê vê qrîz û bê hiqûqiyê em dê îfadeyê nedin."

**Gotinên Erdogan nirxandin**

Turk, her wiha li ser nirxandinên Serokwezîr ku surgunkirina nasnameyên û çandên cûda yê jî Tirkiye yê ku wek faşîstiyê nirxandibû piştgirî da û wiha got: "Ev nêzîkatiyek rast e. Bi rastî jî birçandiya dema Osmaniyan bi mubadeleyê û bi rêya tehcîrê, xwestin bikin yek çandî. Çand û nasnameyên cûda ji vî welatî hatin dûrxistin. Xwestin neteweyek bi yek nîjadî, ava bikin. Hûn dixwazin navê asîmîlasyonê yan jî entegrasyonê lê bikin li ser kurdan projeya yektîpî hate meşandin. Lazime Tirkiye bi paşeroja xwe ve rûbirû bi mîne. Axaftinê Serokwezîr baş bûn lê ne bes in." **ENQERE / DÎHA**

## DTP'î neçûn doz taloq bû

Heyeta dadgehê di danişîna têkildarî ji bo girtina îfadeyên hevserok û parlamenterên DTP'ê dê bi zora polîsan bibin de, birya da ku li heviya bersiva muzakereya ji serokatiya Meclîsê re hatiye nivîsandin bê sekinandin.

Danişîna Hevserokên DTP'ê Ahmet Turk û Emîne Ayna û Parlamenterê DTP'ê yê Amedê Selahattîn Demîrtaş li 11'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê hate dîtin. Palramenterên DTP'ê tevî danişînê nebûn. Heyeta dadgehê, diyar kir ku ji ber wekîl her tim ne li Enqereyê ne teblîgat gihîştiye sekreterên wan lê negihîştiye wan bi xwe. Heyeta dadgehê, bi daxwaza ku li hêviya bersiva muzakereya ji Serokatiya Meclîsê re hatiye rêkirin bê sekinandin, pirskirina aqûbeta muzakereyê danişîn taloqî 29'ê îlona 2009'an kir.

Serokatiya Meclîsê, di nivîsa pêr ji 11'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê rê kir de, wiha got: "Ji ber parlamenterên we gazî wan kiriye her tim li seyhatê ne teblîgat negihîştine destê wan." Serokatiya Meclîsê, destnîşan kiribû dê parlamenterê DTP'ê bi zora polîsan negrin binçav û anî ziman ku dê carek din rewşek wekî ya parlamenterên DEP'ê ku di sala 1994'an de bi zora hatibûn binçavkirin neyê jîn.



## Li Silopî, Cizîr û Patnosê meşên aştiyê

Li navçeyên Silopî û Cizîrê yên Şirnexê û Navçeya Panosa Agiriyê bi slogana, "DTP'ê na çekan bêdeng bike" meş hatin li darxistin. Di meşên bi hezaran kes beşdar bûn de hate xwestin ku operasyon bên rawestandin û ji bo çareseriya pirsgirêka kurd Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan wekî muhatap bê girtin.

DTP'ê ya Silopiyê bi slogana, "DTP'ê na çekan bêdeng bike" meşek li dar xist. Bi hezaran kesên li ber DTP'a Silopiyê hatin cem hev li ber dahol û zirneyê govend girê da.  Meşa ji aliyê DTP'a Cizîrê ve bi slogana "Bila operasyonên leşkerî bi dawî bibin, ji pirsgirêka kurd re çareseriya demokratîk' hate lidarxistin li Parka Cumhuriyetê destpê kir.

DTP'a Panosê, bi slogana "DTP'ê bêdeng neke, çekan bêdeng bike" meşek lidar xist. Şaredar Yusuf Yilmaz jî di nav de nêzî 500 kesên li ber avahiya DTP'a Navçeyê hatin cem hev, pankarta "An aştiyek azad û bi rûmet an jî qet" vekirin û bi sloganên, "Bijî aşitî" û "Vîna me ya siyasî dê neyê astengkirin". **ŞIRNEX / AGIRÎ**



sheakhzubear@gmail.com
Şêx Zubêrê Kurdî

# Bibêjin amîn!

*Kerê serê Ozkok koşt*
*Pê ve nehişt mêjî û goşt*
*Lewma wî rastî bi derewan poşt*
*Berçavka xwe bi tiran şûşt*

Gelî heval û hogiran, şivanên li ber pez, gavanên li ber naxiran, bala xwe bidin van gotinên li nav axuran. Hûn pê hesiyan, nivîskarên tirk dawiya dawîn sûcê tevkujiya Zanqirtê jî xist stûyê kurdiniyê. Min dizanî ku dê dawiya dawîn şeh di serê me de bişikê, heke em bi kurmanciya zireetê bibêjin, "Dê kundir di serê me de biteqe".

Aqilmendên turaniyan hêdî hêdî hemû sûcên xwe dixin stûyê me. Di sala 1915'an de ermen kuştin, niha dibêjin, "Bi xwedê me nekiriye, kurdan kiriye." Niha ji bo me bixapînin dibêjin, "Kalikên me û we li Çanakkalayê li nik hev radizên." Lê heke sibe xwediyên kuştiyên şerê Çanakkaleyê hesab bixwazin, îcar dê bibêjin, "Bi xwedê me nekiriye, kurdan kiriye." Gelek ciwanên kurd bi darê zorê birin Kibrisê, birek ji wan hatin kuştin, hinekan jî maran bi wan veda. Li hemberî vê yekê dewleta turaniyan bi hezaran rûm winda kirin, lê sibe roj heke bikevin tengasiyê dê bibêjin, "Me nekiriye, kurdan kiriye." Tiştê kambaxtir, di salên 1990'î de çeteyên xwînrêj xwîna kurdan rijand, niha dibêjin, "Me nekiriye, îtirafkar û cerdevanan kiriye."

Tiştê ku mirov pê diêşe jî ev e; hinek kurdên me jî dibêjin, li Çanakkale, Kibris û heta li Koreyê me bi hev re şer kiriye. Kes nabêje, "Hey ehmeq, morikên diya we li wan deran qetiyabûn, hûn li çi digeriyan?" Hûn çima ku dewleta turaniyan kurd bi darê zorê birine wê derê û kesên mirine çûne ji kîsê pîra diyan û kesên mayî jî piştî deh salan vegeriyane li xwediyan?

Dewleta turaniyan ji bo parastina pergala kevnik têdikoşe, lê niha sûcên vê pergalê jî dixe stûyê me. Wekî pêşiyên me gotî, "Tu li kiran ne li şekiran binêre."

Em çi bibêjin, bila hemû zixêf û dûjin bibin derzî û şûjin di we re biçin, heta we rastî wekî xeyarekî qeşart û vira xwe jî aşart. Gelî heval û hogiran bibêjin, amîn!

# Min îro hicam kir ser mirina hespan

*Di şûna gezên min de roj û hîv bişkivîn,*
*destên sibehan kêm bûn bi zêdebûna îştahê min re.*
*Çi bikim di dest û mistê min de zanîna qutifandîbûna har e*
*Lê xwîdana devê min bi bêeleqetiya bayê re bû yek,*
*Û hicumê bîranînen rûyê min ê bi por û rih kir.*
*Tu bi xer hatî nav tîrejên hişê min ê westiyayi rubar...*
*Ez bi weşandina barana ser xwe ve ber bi salnameya borî ve diçim.*
*Êdî karê min ê herî saxlem qîr kirine, wekî du caran du şaşwaz im.*
*Wextê ku tarî dest pê dikê*
*ez nasnameyên xwe dihêlim di nijadiya şevê de*
*û dikevim riyan.*
*Helbet ez ê li wî quncî vegerim*
*Ez gelek ji xwe hez dikim.*
*Zêde dibin şînahî di nav nivînên min de,*
*bi tenêtiya zimanê lihevgeriyayî.*
*Bi kevirên fîkave dizelikin nerînên xemgîn ê kûçikên berdayî.*
*Ji bîr kirinê av didin pisîkên gunehan.*
*Min pirsî ji bayê! birayê min tu pêpelûka çenda yê cîhanê yî*
*Wekî baxçegula jinan li lingê xwe dînêrim...*
*Di tarîtiya hilmgirtî de dirêj dibe çûka çûka çivîkan.*
*Ez guhdariya xwe dikim.*
*Di demekî nezîk de bû sibe*
*Rûniştim, û min derçûn derçûn kirin rojên xwe*
*Çiqas xweş e zarokek navê xwe ji bîr bike!*
*Hinek çav; kûr, kemer û belawela dinêrin*
*û hinek nêrîn, neynok dirêj û di daristanê ku*
*yunus tê de dimeşin wek agir pêxistokê cênikan e.*
*Rengê rojê îro ji her gav sortir e.*
*Vê sibê li rojê reşatî barî*
*Kurahiya ku gelî ya dikin gelî ber bi bajêr ve ma bi tenê.*
*Min keviran yek bi yek maç kir*
*Min wekî destmal li ser bedena xwe gerand*
*Kevirên ku li rûyê wan av hatiye raxistin min yeko yeko maç kirin*
*û wek mexmêla li beden pêçayî ajotin nav girseyan.*
*Min lingê xwe li erdê da,*
*Min av vexwar ,*
*pişt av vexwarine hewceye ku mîrov gor zanîna xwe hewl bide xwe.*
*Netirsin! Ronî yên ku we direcifînin keçikên sibê ne.*
*Ger hûn niha di xewna daristanê de bin kevin*
*û hûn bibêjin dengê mele û çîke çîka şûran hinek wê herin.*
*Ber bi hengama kundê ve dirêjiya nêçîrvanan,*
*pelên behrê wextê ku li ser pêlên kefên behrê dezgehên xwe vekirin*
*hûn li wan deran har û reş bimînin.*
*Ez hînî hêjimartinê bûm, min gul kesaxtin.*
*Ez ê edî hespên avê bajom ber bi sibehan.*
*Hûnê bi xweda û bi jinan re werin.*
*Bi kêfxweşiyên makasan dîtinên we,*
*wê ji were teze û bi pîvan bin.*
*Roj niha pergala min xerab dike.*
*Pola qincifî, dengê min qincifî,*
*bi rêveçûna cehniyê xeşîm zinarên çiya,*
*eşê kû min kişandine wek merasîmên eniya min di qincifîn.*
*Ev bila yê dawî be. Ez kevnim lê jana min tame.*
*Ez vê sibehê dest bi stranên nû dikim.*
*Bi derbaskirina sedhezaran çîlmisokan a ji dengê xwe,*
*derya û bejahî yên mirî,*
*pizî ye qelebalixa,*
*di tengahiya xwe ya deştan digihêm*
*û ji bo kesekî bidest dixim xwîna harharî.*
*Sekneke min heye,*
*ez peşkeşê we dikim di serek rêzê rûyê êvaran de.*
*Ez teraza xwe peyda dikim.*
*Diwestin sibehên çarşema û pêncşema ji hengama berî ye.*
*Ez şiyar bûm,*
*ji hêjîrên we hez dikim di qirkirina bergirtina berbanga rojê de*
*Wê Nîsan werin,*
*wê berêken xweda kulîlkan bînin,*
*jê bihartina seqeman,*
*bi gotina,*
*tu li kêdê çavê meyî şildayî de yî ey evîn wê şaşewazî werin.*
*Min bi aloziya tariyê re girt şer.*
*Destê min ê rastê, di wir de, sibeh gav kir şaşiyên rubar,*
*Di noqîn her kes di roja xwe de,*
*Piştre ji bo mirinê, ji bo jînê ketin rêzê.*
*Piştre ji bo evîn û îxanetê ketin rêzê.*
*Piştre cur bi cur bi birîna dara bi tema xwîne zanîn*
*Piştre hîne rûyê nêr a ji hevbûyinê bûn.*
*Rojeke tarî bû.*

**ÎLHAMÎ SAMÎ ÇOMAK**

HAWARA EYŞO

DEMSALA TÛYAN




TÛ LÎ REMO NEHAT




# 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Diyarbekirê



<u>27 Gulan Çarşem</u>
***Vekirina Pêşangehan***
**Wêne:** Çend Zeman Bihurîn / **Fevzî Bîlge**
Jin / **Rabîha Arslan**
**Cih:** Mêvanxaneya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 10.00-10.30

**Wêne:** Azadiya Li Paş Dîwaran / **Kemal Zengin - M.Alî Yaşa** / Girtîgeha Tîpa E ya Mêrdînê
Ji Çavên Zarokên Mexmûrî Mexmûr / **Zarokên Mexmûrî**
**Cih:** Galeriya Hunerê - Sumer Park
**Kat:** 10.30-11.00

**Wêne:** Roj / **Haci Çelîk**
**Cih:** Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcle-Firatê
**Kat:** 11.30-12.00

**Wêne:** Pêşangeha Wênesazên Hewlêr
**Cih:** Fuara Şaredariya Bajarê Mezin **Kat:** 12.00-13.00

**Fotograf:** Qerejdax / **Umut Kaçar**
**Cih:** Salona Pêşangehê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 13.00-13.30

***Dîwançe***
Ji Bo Biranîna Mamoste Selîm Çevîk Rengê Me û Dengê Me / **Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcle Firatê**
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 13:00-15:00

***Şano***
**Kom:** Teatra Perîstan/ Weqfa Çand û Hunerê ya Başak
**Lîstik:** Perîstan
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 17.00–19.00

***Bernameya Danasînê***
**Axaftina Vekirinê:** Parêzer Osman Baydemîr / **Şaredarê Bajarê Mezin a Diyarbekirê**

**Pêşandana Sînevîzyonê / Dîmenên Arşîvê yên Festivalê**
**Dîwançe:** Mehmet Akbaş - Ayfer Duzdaş
**Cih:** Anfî Tiyatro - Sumer Park
**Kat:** 20.00-23.00

<u>28 Gulan Pêncşem</u>
***Panel***
**Mijar:** Jin, Namûs, Azadî
**Beşdar:** Çaglar Demîrel / **Şaredara Dêrikê -** Songul Morsumbul / **Sekretera Jin a KESK'ê -** Parêzer Ayla Akat Ata / **Parlamentera Êlihê ya DTP'ê -** Yard.Doç.Nazan Ustundag / Endama Hîndekariyê ya Zanîngeha Bogazîçiyê
**Moderator:** Yuksel Genç / Rojnamevan - Nivîskar
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 11:00-13:00

***Dîwana Dengbêjan***
Koma Jinên Dengbêj a Botanê
**Cih:** Mala Dengbêjan
**Kat:** 16.00-17.30

***Pêşandana Belgefîlm***
**Belgefîlm:** Girtîgeha Hejmar 5
**Derhêner:** Çayan Demîrel
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Pêşandan:** 16.00–18.30

***Şano***
**Kom:** Şanoya Bajêr a Trabzon
**Lîstik:** Dengê Der
**Cih:** Şanoya Dewletê ya Diyarbekirê
**Kat:** 19.00–21.00

***Meşa Festivalê***
***'Bi Çand û Hunerê Xeyalên Azadiyê Pêk Bînin'***
**Rêgeh:** Deriyê Riha - Deriyê Çiyê
**Kat:** 19:00-20:00
**Konsêra Vekirinê**
Koma Nûjen
Ozlem Ozdîl
Rojda
**Cih:** Qada Deriyê Çiyê
**Kat:** 20:00- 24:00

<u>29 Gulan În</u>
***Şano***
**Kom:** Teatra Arzeba
**Lîstik:** Name
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 14.00–15.30

***Dîwana Dengbêjan***
Dengbêjên Mala Dengbêjan ya Diyarbekirê
**Cih:** Mala Dengbêjan
**Kat:** 14.00-16.00

***Pêşandana Belgefîlm***
**Belgefîlm:** Close Up Kurdistan
**Derhêner:** Yuksel Yavuz
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Pêşandan:** 17.00–19.30

***Şano***
**Kom:** garajistanbul
**Lîstik:** Nûçegihan
**Cih:** Şanoya Dewletê ya Diyarbekirê
**Kat:** 19.00–21.00

***Pêşandana Fîlm***
**Fîlm:** Min Dît
**Derhêner:** Miraz Bêzar
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Pêşandan:** 20.00–22.00

***Dîwançe***
Koma Yekta
Rengîna Mezopotamya / **MKM-Der Edene**
**Cih:** Anfî Tiyatro - Sumer Park
**Kat:** 20.00–23.30

<u>30 Gulan Şemî</u>
***Panel***
**Mijar:** Di Pirsgirêka Kurd de Modela Çareseriya Demokratîk
**Beşdar:** Hatîp Dîcle / **Parlamenterê Kevn ê Depê -** Oral Çalışlar / **Rojnamevan-Nivîskar** Ufuk Uras / **Parlamenterê Stenbolê yê ODP'ê -** Emîne Ayna / **Hevseroka DTP'ê - Parlamentera Mêrdînê**
**Moderator:** Ayhan Bîlgen / **Sekreteryaya Meclîsa Aştiyê**
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 11:00-15:00

***Çalakiyên Zarokan***
**Danîna Qurnefîlan a Zarokan Ji Abîdeya Jiyanê Re**
**Cih:** Parka Koşuyolu
**Kat:** 14.00-15.00

***Şahiya Bafirokan***
**Cih:** Kırklar Dagi
**Kat:** 16.30-18.00

***Pêşandana Dansê***
**Kom:** Civata Dansê ya Mezopotamyayê
**Proje:** Destana Kawayê Hesinkar (Promîer)
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 16.00-18.00

***Pêşandana Fîlm***
**Belgefîlm:** Du Ziman Yek Bahol
**Derhêner:** Ozgür Dogan - Orhan Eskîkoy
**Cih:** Mega Center CihneMall
**Pêşandan:** 16.30–18.30

***Meş***
**Rêgeh:** Parkorman- Hemberî Salona Dawetê ya Ava / Dîcle Kent
**Kat:** 18.30-19:30

***Konsêra Girtinê***
Çîroka Rêwitiya Me / **Şahiya Stranan- Hunermendên NÇM'ê**
Koma Muzîkê ya Gose ya Bask
Xemgîn Bîrhat, Peywan Arjîn, Hekîm Sefkan, Zozan / **Hunermendên Akademiya Çand û Hunerê ya Kurd**
Alî Asker
**Cih:** Hemberî Salona Dawetê ya Ava/Dîcle Kent
**Kat:**19.30–00.00

***Atolye***
**Fotograf:**
**Perwerdekar:** Umut Kaçar-M.Sait Taşkıran
**Cih:** Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcle - Firatê
**Mêjû:** 19-25 Gulan
**Şano**
**Perwerdekar:** Muhsin Osman - Durukan Ordu
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Mêjû:** 11-25 Gulan
**Cam-Seramîk**
**Perwerdekar:** Firat Erdogan
**Cih:** Sumer Park
**Mêjû:** 19 Gulan

***Sînema***
**Perwerdekar:** Yeşim Ustaoğlu
**Cih:** Salona Sinemayê ya Burhan Karadenîz
**Mêjû:** 23–24 Gulan

***Def***
**Perwerdekar:** Mamoste Şêrko
**Cih:** Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcle – Firatê
**Mêjû:** 04-18 Gulan

***Dansên Gelêrî***
**Perwerdekar:** Osman Bozkurt
**Cih:** Sumer Park
**Mêjû:** 10 - 25 Gulan

✓ Beşdariya meşên festîvalê wê bi cil û bergên gelêrî be.
✓ Fîlm-Belgesel û şano wê bi bilêt bin. Bilêt 2 TL ye.
✓ Hûn dikarin bilêtan ji Gerînendehiya Çandê ya Şaredariya Bajarê Mezin û gîşeyên li Kuçeya Hunerê peyda bikin.

www.arsivakurd.org

# Li Amedê dema mihrîcanê

9'emîn Mihrîcana Çand û Hunerê ya Amedê îro dest pê dike. Di mihrîcanê de ziyafetek dewlemend a sînemayê li hêviya sînamehezan e. Hunermendekî surprîz jî di roja dawî de derkeve ser dikê

9'emîn Mihrîcana Çand û Hunerê ya Amedê ku dê di navbera 27-30'ê gulanê de bê lidarxistin îro dest pê dike. Di çarçoveya mihrîcanê de dê panelên bi mijara pirsgirêka kurd û namûs, jin û têkiliya azadiyê bên lidarxistin. Mihrîcan dê bi vekirina 4 pêşengehên wêneyan ên xîtabî beşên cuda dikin dest pê bike.

Di bernameya îro de ji bilî pêşengeha wêneyan, şano û Navenda Çand û Hunera Dîcle Firatê, ji bo bîranîna Mamoste Selîm Çevik dê li avahiya navenda çandê konserekê bide. Saet di 19.30'an de di çarçoveya danasîna bernameyê de dê Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr axaftina vekirina bernameyê pêk bîne. Roja yekem a mihrîcanê dê bi konsera Mehmet Akbaş û Ayfer Duzdaş a li Salona Tiyatro ya Anfî ya Sumer Pakê bi dawî bibe.

### Jin û namûs dê bê nîqaşkirin

Di roja duyemîn a mihrîcanê de, bi moderatoruya rojnamevan Yuksel Genç û tevlêbûna Şaredara Dêrikê Çaglar Demîrel, Sekretera Jinan a KESK'ê Songul Morsumbul, Parlamentera DTP'ê ya Êlihê Ayla Akat Ata, Hîndekara Zanîngeha Bogazîçî Alîkar Doç. Nazan Ustundag, panela bi mijara, "Jin, namûs, azadî" dê bê lidarxistin. Her wiha dê panel bibe wekî fînala îsal a kampanyaya "Namûsa me azadiya me ye" ya ji aliyê DOKH'ê ve tê meşandin. Di duyemîn roja mihrîcanê de dê dîwana dengbêjan bê avakirin û belgefîlm bê nîşandan. Di roja duyemîn a mihrîcanê de saet di 19.00'an de dê meşa "Bi manata çandê ber bi pêkanîna xewna azadiyê ve" ji Urfakapi dest pê bike û li Dagkapi bi dawî bibe. Duyemîn roja mihrîcanê dê bi konsera hunermend Rojda û Ozlem Ozdîl bi dawî bibe. Di sêyemîn roja mihrîcanê de dê şonayên kurdî û tirkî û fîlmê ku Mîraz Bêzar derhêneriya wê kiriye yê bi navê "Min Dît" dê bên nîşandan. Sêyemêr roja mihrîcanê dê bi konsera Koma Yekta ya NÇM'ya Edeneyê bi dawî bibe.

### Zarok nehatin jibîrkirin

Di şahiyê de bangî beşê civakên cûda jî kiriye û di dawiya şahiyê de zarok jî dê cih bigirin. Di roja dawiyê de ku çareseriya pirsgirêka kurd di rojevê de ye, bi Moderatoriya Sekreterya Meclîsa Aştiyê ya Tirkiyeyê Ayhan Bîlgen, Parlamenterê berê yê DEP'ê Hatîp Dîcle, rojnamevan Oral Çalişlar, Parlamenterê ODP'ê yê Stenbolê Ufuk Uras û bi tevlîbûna Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna dê panela "Di pirsgirêka kurd de, modela çareseriya demokratîk" bê lidarxistin. Mîhrîcan wê bi meşa ku bi daxwaza pirsgirêka kurd bi rê û rêbazên aştiyane bê çareserkirin, bi dawî bibe.

### 12 rojan 21 fîlm

Di berfirehiya mihrîcanê de navbera 22'yê gulanê û 4 hezîranê de, mihrîcana fîlman dê 12 rojan bidome û 21 fîlm tên nîşandan. Di mihrîcana îsal de fîlmên ku li welat û derveyî welat ku bûne mazhara eleqeyê û fîlmên ku di demên dawî de ên binkî û fîlmên serbixwe yên Ewropayê jî tê de hene. Nîşandana fîlman li Galerîa Sînemaya Ewropa, Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin û di Mega Center Cînemall dê werin nîşandan. Fîlmên Sinif, Sonbahar, Zarokên Taxên din (Başka Semtîn Çocuklari), Hungry (Birçîtî), Mommo, Gîtmek, Mîlyoner, Sut, Kutuya Pandora (Pandora'nın Kutusu), Jiyan heye (Hayat Var), Ji ezmanan 3 sêv ketin (Gokten Uç Elma Duştu), Şîr (Mîlk-Sut), Noqte (Nokta), Heşt rojên Alî (Ali'nin Sekiz Gunu), Zilamê li ser têlê (Teldekî Adam), Rumba, Min Dît, Zimanek û 2 bawil (Îkî Dîl Bîr Bavul), Girtîgeha No 5 (5 No'lu Cezaevî), Close Up Kurdistan û Nergîz Bişkivîn, dê werin nîşandan. **AMED / DÎHA**




# 6'emîn Mihrîcana Fîlmên Kurdî

Amedekariyên 6'emîn Mihrîcana Fîlmên Kurd ku dê di dawiya sal 2009'an de bi tevlîbûna derhênerên kurd li paytexta Îngilistanê Londonê pêk bê dest pê kir.

Amadekariyên ji bo 6'emîn Mihrîcana Fîlmên Kurd ku dê di dawiya sala 2009'an de li Londonê pêk bê hatin destpêkirin. Komîteya Amadekar a Mihrîcanê ku ji gelek hunermend û derhênerên kurd ên wekî Mistefa Gundogdu, Heta Muftî, Tara Caf, Bêrî Şelmaşî, Saman Lawe, Rênas Caf, Setar Çemenî Gul, Vîda Salihî, Enwer Şêxanî, Ehmed Mehmûd, Kajaw Mihemed Alî û Mihemed Alî Etrûşî pêk tê, destnîşan kir ku hemû derhênerên têkildarî kurdan film çêkirine dikarin beşdar bibin.

### Pêşbirka Yilmaz Guney

Li gorî agahiyên ji Komîteya Amadekar a Mihrîcanê hatin girtin, hemû hunermend, derhênerên kurd an jî yên biyanî, bi şerta ku fîlmên wan têkildarî kurdan hatibin kişandin dikarin beşdarî mihrîcanê bibin. Komîteyê, diyar kir yek şertê din jî ew e ku wergera hemû fîlman bi îngilîzê hebe.

Komîteya Amadekar a Mihrîcana Kurdî, her wiha derbirî ku dê di çarçoveya 6'emîn Mihrîcana Fîlmên Kurd de îsal cara duyemîn pêşbirka fîlman a Yilmaz Guney bê lidarxistin û da zanîn heta 15'ê tîrmeha 2009'an kesên dixwazin tevî pêşbirkê bibin dikarin serî lê bidin.

### Şet û mercên beşdarbûnê

Komîteya Amadekar a Mihrîcana Fîlmên Kurdî, tevlêbûna pêşbirka fîlman jî wiha vegot: "Filmên tevî mihrîcanê bibin divê naveroka wan têkildarî kurdan be. Hunermend û derhêner dikarin bi fîlmê metrajdirêj, fîlmên metrajkurt û dekomentera ku wergera wê ya înglîzî çêbûbe, şêwazê 35mm, HD, Mini DV, DVD û gelek şêwazên din dê beşdarî mihrîcanê bibin. Kopyayên fîlman dê di arşîva Mihrîcana Fîlmên Kurdî ya li Londonê de bên parastin." Komîteya amadekar da zanîn ku di dawiya sala 2009'an de dê mihrîcan pêk bê. **HEWLÊR**

# Li Manîsayê panela ziman

Li Manîsayê panela ziman hate lidarxistin. Mamosteyê TZPKurdî di panelê de bal kişand ser asîmîlasyon û otoasîmîlasyona li hemberî zimanê kurdî.

Li salona panelê pankarta, "Bila kurdî bibe zimanê fermî yê perwerdehiyê" hate daliqandin. Endamê Koordînasyona TZPKurdî Qahir Bateyî, momosteyên TZPKurdî Felemez Çevîrer û Xecê Şen wekî peyvker beşdarî panelê bûn. Panelê bi rêzgirtina ji bo şehîdên demokrasiyê dest pê kir.

Desthilatdar bi asîmîlasyonê dest bi kar dikin. Bateyî ku axaftina ewil kir, bal kişand ser asîmîlasyon û oto-asîmîlasyona li ser zimanê kurdî. Bateyî diyar kir ku dewa dewletên serdest dixwazin gelekî ji holê rakin berî her tiştî êrîşî zimanê wan dikin û wiha domand: "Bi asîmîlasyonê dest bi kar dikin. Asîmîlasyon jî bi ziman dest pê dike. Ji ber vê yekê ev heştê û şeş sal e dewleta tirk asîmîlasyoneke pir qirêj li ser zimanê kurdî dide meşandin. Di encama vê asîmîlasyonê de tahrîbateke gelek mezin li ser ziman û çanda kurdî çêbû. Ji ber vê yekê jî asîmîlasyona li ser zimanê kurdî veguheriye oto-asîmîlasyonê. Ev yek jî ji bo zimanê kurdî xetereyeke gelekî mezin e." **MANÎSA / DÎHA**

## Bo fîlmê leyizvanên kurd û tirk digerin

Lîstikvanê navûdeng Tony Grisoni ji bo fîlmê xwe yê bi navê Kingsland ku mijara fîlmê kurd in li lîstikvanên kurd û tirk digere.

Mijara fîlmê derhênerê navûdeng Tony Grisoni jiyana kurdên ku li Îngilistanê dijîn e. Ji bo fîlmê Kingsland hewcedarî bi lîstikvanên kurd û tirk yên temenê wan di navbera 12 û 50 de diguhere hene. Ji bo fîlmê dê 31'ê gulanê li Navenda Çanda Kurd a Haringeyê pêşbirk pêk bê. Derhêner par kurtefîlma Kingsland kişand û piştî ku fîlmê li Îngilistanê xelat wergirt derhêner biryar da ku fîlmê metrajdirêj bikişîne. Grisoni diyar kir ku dê di mehên îlon û cotmehê de dest bi kişandina fîlmê xwe bike. Derhêner bangî hemû berendanên lîstikvaniyê kir ku beşdarî pêşbirka bijartina lîstikvanan bibin. Kesên ku eleqedar dibin dikarin bi vê emaîlê xwe bigihînin berpirsan û agahiyan bigirin; kingslandfilm@googlemail.com. **LONDON**

# Wêneyên Yilmaz Guney ên Cannesê

**ALÎ GULER** CANNES / ANF

Derhênerê kurd ê di cîhanê de navdar Yilmaz Guney wêneyên ku di sala 1982'yan li Festîvala fîlman ya Cannesê de kişand û hê li cihekî nehatine nîşandan di ANF'ê de hatin weşandin.

Derhênerê navdar ê kurd Yilmaz Guney piştî ku ji Tirkiyeyê derket û çû Fransayê bi fîlmê xwe yê 'RÊ' tevli mîhrîcana fîlman a herî bi prestîj Cannesê bû û ji bo xelata 'Palmiya Zêrîn kete pêşbirkê. Guney di nava ev qas fîlmî de bi fîlmê Costa Gavras The Mîsssîng- Winda xelata 'Palmiya Zêrîn' girt û pirsgirêka kurd di cîhanê de belav kir. Derhêner Guney bi senaryo û hûnaka xwe serkeftin bi dest xistibû. Guney di sala 1983'an de li Tirkiyeyê mafê wî yê welatîbûnê jê hatibû girtin. Di heman salê de li Fransayê filmê xwe yê Le mur (Dîwar) kişand û piştî salekê ji ber nexweşiya pençêrê jiyana xwe ji dest da. Wêneyên Yilmaz Guney ku di wê demê de li Cannesê kişandibûn, di arşîva sînameger Hasan Karabulut de hatin dîtin. Wêneyên ku 27 salan berê li tu cihî nehatiye weşadin derketin holê. Di wêneyên Guney de, îmgeyên xurûr, xemgînî, kêfxweşî û xwebaweriyê derdikevin pêş. Kareyên Guney ên Cannesê.











www.arsivakurd.org

# Komeleya Guldunyayê tê girtin



Waliyê Bedlîsê dest danî ser defterên Komeleya Guldunyayê û der barê komeleyê de lêpirsîn da destpêkirin. Piştî peyama Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan komela na divê akademî bê vekirin walîtiya Bedlîsê peyam wekî îxbar nirxand û der barê komeleyê de lêpirsîn da destpêkirin.

Walîtî dest danî hemû defterên komeleyê. Komeleya Guldunyayê ji hêla jinên Bedlîsê ve hate vekirin. Guldunya di sala 2004'an de ji hela birayê xwe bi hinceta namûsê hate kuştin. Komele bi navê wê hate vekirin. Endam û dildara komeleyê Gul Aksoy, diyar kir ku salek û nîv e di nav şert û mercên xirab de xebatê dikin. Aksoy, got ku piştî ku komele hate vekirin gelek derdoran aciziya xwe li hemberî komeleyê nîşan da û wiha got: "Der barê komelayan de 3 û 4 meh beriya niha Abdullah Ocalan bi riya parêzerên xwe daxuyaniyek da. Li gorî daxuyaniyê ne komele divê akademî bê vekirin. Ev daxuyanî ji bo komeleya me nehatiye kirin. Ji hemû jinan re hatiye gotin. Li Bedlîsê tenê rêxistineke jinan heye û ev jî komeleya Guldunyayê ye.

Piştre waliyê Bedlîsê der barê komeleyê de lêpirsîn da destpêkirin. Niha em li benda daxuyaniya midûriyetê ne. Em jî li bendê ne ku komele bê girtin."

Aksoy, di axaftina xwe de diyar kir ku komeleyeke serbixwe ye. Aksoy, daxuyand ku ji bo jinan bernameyên cuda hatin amadekirin û wiha got: "Dema em ji bo karê fermî diçin dezgehên fermî rastî astengiyên cuda tên. Di karê me de her tim zehmetiyan derdixin. Li bajarê me komeleyên wekî camî, çand û dîkan hene û ji bo wan tu pirsgirêk nîn e. Lê komeleya me salek û nîv e hatiye avakirin û her tim rastî astengiyan tên. Li Bedlîsê îsal 8'ê Adarê bi 20 jinan re hate pîrozkirin û di bin kontrola polîsan de pîrozbahî pêk hat. Bi vê komeleyê hedefa me ye ku xizmetê bidin jinên ku bi şîdetê re rû bi rû mane. Heta niha li gorî derfetên xwe ji 40 jinan re bûne alîkar. Her wiha gelek jinên ku fikr û ramanên wan cuda tên komeleyê." **BEDLÎS**



# 'Divê makeqanûn biguhere'

## Jinan got ku makeqanûn di dewra darbeyan de hate çêkirin divê bi tevahî bê guhartin. Jinan diyar kir ku heke çandên cuda û jin tê de nîn bin hingê ev makeqanûn antî demokratîk e

Li Tirkiyeyê jin jî tevî nîqaşên têkildarî guhertina makezagonê tên meşandin dibin. Jinên ku der barê pirsgirêka jinan de xebatan dimeşînin, diyar dikin ku divê makezagona di dema darbeyê de hatiye amadekirin bi giştî bihuherin.

Li Tirkiyeyê makeqanûna 1982'an ku wekî 'Makeqanûna Darbeyê' tê binavkirin, 26 sal in dibe mijara nîqaşan. Di demên dawî de ji nû ve ev nîqaş hatin rovejê û ji bo ku makeqanûn ji nû ve bê sazkirin daxwaz tên ziman. Her wiha jinên ku der barê pirsgirêkên jinan de dixebin tevli nîqaşan bûn û wan jî daxwazên xwe anîn ziman.

Parêzvana mafên mirovan parêzer Eren Keskîn anî ziman ku pêwist e makeqanûn bi giştî bê guhertin û her wiha got ku ev makeqanûn ji aliyê dagirkeran ve hatiye avakirin. Keskîn wiha dirêjî da axaftina xwe: "Pêwist e ku makeqanûn kin û demokratîk be. Tu wateya dirêjbûna makeqanûnan nîn e. Asta herî dawî ya serdestiya zilam mîlîtarîzm e. Dewleta Tirkiyeyê xwediyê vê bingehê ye. Lewre jî şopên mîlîtarîzmê li ser makeqanûnê hene. Ev helwestên mîlîtarîst herî zêde bandora xwe li ser bindest û bi taybetî jî jinan dike." Keskîn anî ziman ku divê di makeqanûnê de li ser têgeha tirkbûne nesekinin û wiha berdewam kir: "Divê di makeqanûnan de bê nivîsandin ku Tirkiye ji gelek nasnameyan pêk tê. Divê hemû kes hîs bike ku aydê vir e. Çimkî di makeqanûnê de zêde li ser tirkbûnê tê sekinandin. Divê ev yek di makeqanûnê de tunebe."

### Divê nêrînên jinan bêne girtin

Parêzer Keskîn anî ziman ku divê wekheviya jin û mêr bi awayekî vekirî û zelal têkeve makeqanûnê. Keskîn xalên parastina malbatî 'Wekheviya jin û mêran, bi taybetî jî parastina dayikê' ên di makeqanûna niha de bi bîr xistin û wiha axaftina xwe berdewam kir: "Têgeha parastina jinê jî jinê diavêje plana duyemîn. Makeqanûn di her warî de behsa wekheviya jin û mêr dike. Di warê siyasetê de divê wekheviya jin û mêr têkeve makeqanûnê. Di makeqanûna de di mijara xweîfadekirina azad de peyva 'azad' cih digire. Lê hema di xala 26'emîn de tê gotin ku ji ber sedemên etîk û ewlehiya neteweyî dibe ku bê kêmkirin. Ev yek divê teqez di makeqanûna nû de cih negire. Têgeha ewlehiya neteweyî tenê ji bo meseleya kurd hatiye danîn. Divê ev têgeh ji makeqanûna nû rabe. Divê her kes xwe bi awayekî azad îfade bike."

Keskîn destnîşan kir ku di pêvajoya guhertina makeqanûnê de Komîsyona Makeqanûna TBBM'ê divê ji hemû rêxistinên civaka sivîl û yên jinan nêrînan bigirin û wiha berdewam kir: "Li Tirkiyeyê dewlet xwe li dijî gel diparêze. Lê makeqanûn ji bo ku gel rehet bike tê avakirin."

Nivîskar Yildiz Ramazanoglu di nava grûba Îslamî de tê nasîn diyar kir ku li şûna guhartinên hin qanûnan divê hemû makeqanûn bê guhertin. Ramazanoglu, destnîşan kir ku makeqanûn bi derbeyan hatiye çêkirin û di nav de mafê mirovan hatiye binpêkirin û wiha axaftina xwe dom kir: "Ji ber vê sedemê guhertina hin qanûnan ne girîng e. Heke qanûn bê guhertin divê hemû cureyên asîmîlasyonê, meyla totalîter û faşîzanî hemû ji holê bê rakirin. Ji bo jiyaneke bi hev re divê peymaneke civakê hebe. Divê qanûn bibe bersiva pirsên hemû kesan û ji bo biratiyê bê çêkirin. Her wiha guhertina zîhniyeta Tirkiyeyê jî girîng e û şoreşeke zîhnî hewce ye. Heke maf hebe divê derfetên bikaranîna maf jî hebin. Ji bo ji nû ve sazkirina makeqanûnê divê ji hemû derdoran nêrîn bê girtin." **STENBOL**



Eren Keskîn



### 'Divê nêrîna hemû kesan bigirin'

Xebatkara Komeleya Jinan a Gokkuşagiyê Ayten Kordu jî di axaftin xwe de bal kişand ser makeqanûnê û diyar kir ku divê bi tevahî makeqanûn bê guhertin. Kordu, daxuyand ku makeqanûn di dewra darbeyan de hate çêkirin û wiha axaftina xwe dom kir: "Di nîqaşên ku li Tirkiyeyê pêk tên de pirsgirêka kurd nayê ziman. Li gorî me heke çandên cuda û jin di nava makeqanûnê de nîn be ev makeqanûn antî demokratîk e. Makeqanûna heyî tenê zimanek û nasnameyekê nas dike. Divê makeqanûn ziman û çanda cuda jî biparêze û bersivê bide pirsên civakê. Dîsa dema makeqanûna nû hate amadekirin divê nêrînên kurd, jin û rêxistinên sivîl jî bêne girtin." **STENBOL**

# Li kolanê bi kêrê 7 caran êrîşê wê kir

Li Edeneyê jina bi navê Mutlu Ozyeşîlbaş (37) dema ku bihîst dergistiyê wê zewicandiye û bavê du zarokan e, der barê wî de gilî kir. Li ser vê yekê derxistiyê wê yê berê li nava kolanê bi kêrê 7 caran êrîşê wê kir û ew kuşt.



Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin bûyer li taxa Afetevlerî li nêzî Lojmanên Maliyeyê qewimiye. Jina bi navê Mutlu Ozyeşîlbaş ku ev du sal in bi Yalçin K. re nîşanî ye, pê hesiya ku dergistiyê wê zewicandiye û bavê du zarokan e. Li ser vê yekê Ozyeşîlbaş têkiliya xwe pê re qut dike û her wiha ji bo bi wî re têkiliya xwe qut kiriye rastî gefên wî hatiye. Ozyeşîlbaş, xwîşk û dayîka xwe ji bo ku gilî bikin çûbûn edliyê. Dema ku ji edliyê vedigerin Yalçin K. tê cem wan û dibêje tu min naxwazî? Dema ku Ozyeşîlbaş bersiva neyînî dide rastî êrîşa dergistiyê xwe tê. Ozyeşîlbaş bi 7 cihan birîndar dibe û wê radikin nexweşxaneya Dewletê ya Edeneyê. Ozyeşîlbaş ligel hemû mudaxaleyan nehat xelaskirin. Piştî bûyerê Yalçin K. hate binçavkirin. **EDENE**

## Mamoste Xemrevîn

### Cejna Zimanê Kurdî

Îsal jî li her derê cihanê cejna zimanê kurdî bi coşeke mezin hat pîrozkirin. Bi taybetî jî li Tirkiyeyê, li bajarên Serhedê gel pir bicoş bû. Lê me dixwest ku li bajarên din jî heman coş hebe. Lê mixabin ev yek li gor dilê me pêk nehat.

Ji ber hin sedeman li Amedê eleqeya gel a ji bo cejnê kêm bû. Bi sê panelên ku bi her awayî ziman û civak hat nîqaşkirin beşdariya gel qet çê nebû. Ji bo beşdariyê hem agahdarî kêm bûn hem jî gava ku sedemên nebeşdarbûnê dihat pirsîn jî bersiva " êdî gel ji panelan aciz bûye" dihat bidestxistin. Piştî vê pratîkê û encamên ku me bi dest xistin jî divê xebatkar, an jî kesên ku van çalakiyan amade dikin, dev ji çalakiyên salonan berdin û çalakiyên wekî şahiya li parka Koşuyoluyê li dar bixin; her çi qas beşdarî kêm bû jî, girse ji ya panelan qat bi qat zêdetir bû û gelekî bala gel kişand. Di şahiyê de siyasetmedara Kurd Birêz Leyla Zanayê jî wekî her carê di axaftina xwe de girîngiya ziman û siyaseta kurdan derxist pêş. Kêmasiyên di warê zimên de çi ne û ji bo çi em kurd qasî ku tê xwestin xwedî li zimanê xwe dernakevin bi bîr xist.

Wekî gelek kesan, li gor min jî êdî gelê kurd xwe bi her awayî gihandiye qonaxeke baş û xwedî li nirxên xwe derdikeve, lê divê di warê zimên de jî ev xwedîlêderketin çê bibe, gavên ber bi çav bên avêtin û bi rihekî seferberiyê nêzîkî zimanê xwe bibin. Tenê bi gotin û axaftinê jî ev yek pêk nayê û nabe ku mirov şîretan li der û dora xwe bike, lê bi xwe tu tiştekê/î neke. Em gelek kesên ku di warê ziman û siyasetê de dixebitin û girîngiya zimên derdixin pêş jî dikevin nav van kêmasiyan. Gelek kes derdikevin pêşberî civakê qala zimên dikin û gava ku pişta me dikeve civakê jî dest bi axaftina zimanê serdest dikin. Ev kesayetî kesayetiya kesên nexweş û pişaftî ye. Êdî hatiye asteke wisa ku rih û mêjiyê wê/Î ketiye bin bandora, çanda serdet û nikare xwe jê biqetîne.Em dizanin ku ziman nasnameya gelekî ye û nasname jî hebûna gelan nîşan dide. Heke em bixwazin her hebin, divê em xwe ji vê kesayetiyê biparêzin. Ev parastin jî bi riya xebatên di nav gel de pêk tê. Nêzîkatiya gel, bi xwe re parastina çand û zimên, di heman demê de jî ji çanda serdest dûrxistinê tîne. Ji bo vê jî, mirov dikare çalakiyên sala bê, wekî şahiyên taxan li hemû taxên bajêr li dar bixe. Bi beşdariya gel sohbet û xebatên li ser çand, ziman û dîrokê, dê bernameyan dewlemendtir bike û zêdetir bala şêniyên taxan bikişîne.

Em careke din, li welatekî azad, cejna zimanê kurdî li hemû gelê xwe û hezkirên vî zimanê xweş pîroz dikin.


# BÎRANÎN

Morî morî şiverêkan rêz dikim
Li ser meşa
Ku em destpêkirinan pê çêkin
Di berdewamiya temenekî de
Bi strandina newayeke dilşewat
Di nav şerma tariya dîrokî de
Lê bizanibe
Em ê şopdarên riya we bin...



*Samî ÇOMAK (Firat)*
*(1974- 2005)*

**Li ser navê malbata wî, dayika wî Zeytûn, bavê wî Cebraîl, xwîşk û birayê wî Reyhan, Cengiz, Nazim, Îlhan, Suna, jinbira wî Aygul, Songul, xwarziyê wî Ranya Şeval, Helîn Sarya, Hivro**


www.arsivakurdi.org

Hawar
27 Gulan 2009 Çarşem





Gundê Kîvexê ku xwedî dîrokeke 4 hezar salan e di sala 1993'yan de hate valakirin. Gund ji aliyê leşker û cerdevanan ve hate wêrankirin. Gundiyên ku koçî Ewropayê kirine dixwazin vegerin gundê xwe

# Dîroka 4 hezar salan wêran kirin

**HAYDAR HAYKIR** ŞIRNEX / DÎHA

Gundê Kîvexa navçeya Hezexa Şirnexê ku xwedî dîroka 4 hezar salan a êzidiyan e, ji hêla leşker û cerdevanan ve hate talankirin. Xwediyên gundê wergerandine xirabeyekê dixwazin cardin vegerin gundê xwe.

Gundê Kîvexê yê navçeya Hezexa Şirnexê xwedî dîrokek bi hezaran salan e. Heta demek berî niha jî hezar 500 kes li gundê Kîvexê dijiyan. Lê gund di 1993'yan de wekî bi hezaran gundên kurdan di bin navê "Ewlehiyê" û di encama zordariya cerdevanan de hate valakirin. Piştre jî gund ji hêla cerdevanan ve hate wêrankirin. Gelek malên ku çanda dîrokî ya êzdayetiyê bi ser re hatine xirabkirin. Derî û pencereyên van avahiyan jî hatine jêkirin. Malên bi hezaran sal berî niha hatine çêkirin, gelek fîgur û nexşên çandî û dîrokî dihundirînin. Lê piştî valakirina gund van malan tahrîbatek mezin dîtiye. Her wiha gund nesîbê xwe ji topên leşkeran jî girtiye.

Gundê gelek caran bûye hedefa topên leşkeran ber bi tunebûnê ve diçe. Niştecihên gund jî piştî gund bi zorê hate valakirin, reviyane Ewropayê. Hemwelatiyên cardin dixwazin vegerin ser gundên xwe, dixwazin pêşiya wan bê vekirin. Ji gundiyan Xalef Koyun (60) diyar kir ku pêşiyê ciwan, piştre kesên navînsere û herî dawî jî kal piştî 93'yan ji gund derxistine.

**Di sala 2005'an de dîsa qewitandin**

Koyun, daxuyand ku ji bo vegerîn gundê xwe doz vekirine û bi bîr xist ku ji Serokomarê wê demê û Serokwezîr re jî daxwazname şandine. Koyun, diyar kir ku bi teşebûsên xwe yên di 2005'an de, dîsa vegeriyane gundê xwe û îdia kir ku li ser riya gundê wan teqemenî hatiye cihkirin û avêtin stûyê wan.

Koyun, her wiha derbirî ku dijûnên ji bo bibin cerdevan li wan hatiye kirin. Koyun, diyar kir ku ji bo gundê xwe biterkînin, cerdevan û leşkeran timî av û ceyrana wan qut kirine. Koyun, anî ziman ku êdî jiyana li gund li wan bibû kabus û bilêv kir ku di nava heman salê de ji bo ewlehiya canê xwe ji neçarî gund terikandine. Koyun, destîşan kir ku lazim e dewlet di demeke kin de pergala cerdevaniyê rake û wiha axivî:

"Êdî em dixwazin vegerin gundên xwe û lazim e dewlet jî vê rewşê bi dawî bike û pergala cerdevaniyê rake. Ji bo aştî û hizûra welatê me ev şert e."

**Ji gundiyan 75 hezar euro xwestin**

Koyun, daxuyand ku kurê Parlamenterê AKP'ê yê Mêrdînê Suleyman Çelebî, parêzer Mehmet Saît Çelebî ji wan re gotiye ku dikarin li hemberî 75 hezar euro li gund bimînin. Koyun diyar kir ku gundê wan vergerandine kavilistanê û xwest ku pergala cerdevaniyê bê rakirin. Koyun, derbirî ku bi valakirina gund, dîrok ji ji holê rakirin û diyar kir ku ji bo parastina dîroka xwe, lazim e her kes vegere ser axa xwe.



## Di bin bombebaranê de pincarî diçinin

**MEHMET NURÎ EKINCÎ** XAKURKÊ / ANF

Li Bradostê li Herêmên Parastinê yên Medyayê ligel bombebarana Îran û Tirkiyeyê gundî berê xwe didin çiyan û rêvasan berhev dikin.

Li Kurdistanê demsala biharê xweşikbûna xwe didomîne. Gundiyên başûrê Kurdistanê jî mezin, biçûk, jin û mêr kal û pîr hemû bi hev re berê xwe didin çiyayên Kurdistanê û rêvasan dikin. Li Başûr ji ber rewşa aborî ya gel ne baş e, gel ji bilî sewalkariyê pincarî jî diçinin. Bi taybetî gundiyên Başûr bi vî rengî debara malbatên xwe dikin. Gundiyên herêma Bradostê jî berê xwe didin Xinêrê, Xakûrkê û Zagrosan û li vir pincarî kom dikin û kîloya pincarî bi dolarekî difiroşin. Gundiyên herêmê ligel bombebarana Îran û Tirkiyeyê li çiyan bi taybetî rêvas, guhbizin, guhreşk, kivark û kivzan kom dikin. Gundiyên ku van nebatan diçinin dibêjin ku ew mecbûr in van kom bikin û bi vî rengî debara xwe bikin. Di nava kesên ku tên pincarî diçinin de pêşmergeyên ku bi mehaneya xwe nikarin debara xwe bikin, zarokên ku pêdiviyên xwe yên dibistanê bi cih bînin, jinên ku zarokên xwe li malê dihêlin jî hene. Her wiha gundiyên herêmê dibêjin ku biharê tişta herî xweş derketina çiyan û berhevkirina pincarî ye.

Ji bilî gundiyên herêmê gerîla jî eleqeyeke mezin nîşanî rêvas û pincarên din didin. Rêvas a ku tehma xwe hinekî tirş e bi taybetî di meşê de di nava gerîlayan de eleqeyê dibîne.

## Faytonvan bi gazinc in!

Faytonvanên Îzmîrê ku xwe weke "rûyê ken ê Îzmîrê" bi nav dikin ji ber nûçeyên ku di demên dawî de li çapemeniya herêmî derdikeve bi gazinc in. Her wiha faytonvan ji bo ku Şaredarê Bajarê Mezin ê Îzmîrê Azîz Kocaoglu ku sozên xwe yên beriya hilbijartinan bi cih neaniye jî nerazîbûn nîşan dan.

Li Îzmîrê faytonvanên ku di bin pira Kahramanlar a li taxa Hîlalê heta êvarê disekinin û êvarê jî turîstan li Kordonboyuya li semta Alsancakê digerinin bi gazinc in. Hem nûçeyên der barê wan de di çapemeniya herêmî de derketine û hem jî şaredarê ku sozên xwe bi cih neaniye faytonvan aciz kirine. Faytonvanê bi navê Yulmaz Yunlu ku pîşeya bavê xwe didomîne diyar kir ku ew ji bo vê pîşeyê bidomînin çi ji destên wan tê dikin. Lê nûçeyên ku di demên dawî de der barê wan de derdikevin wan diêşîne. Yunlu wiha axivî: "Fayton bûne sembola Îzmîrê lê ligel vê jî şaş nêzî be bidin. Dema ku hespên me deng derdixin me gilî dikin, zabite cezayan li me dibirin. Ji ber ku em her tim li Kordonboyu dimînin bêhtir li vir bi çavekî baş li wan nayê nêrîn." Yunlu got ku Şaredarê Bajarê Mezin a Îzmîrê Azîz Kocaoglu berê pirsgirêkên wen guhdar dikir lê niha hema bêje wan diqewirîne. Yunlu xwest ku Kocaoglu sozên xwe yên ku beriya hilbijartinan daye bi cih bîne.



Faytonvanê bi navê Şukru Ulker jî got ku bi salan e faytonvaniyê dike û bi pereyê ku qezenc dike ve jî debara malbata xwe dike. Lê niha karê wan ne baş e û sedema vê yekê jî nêzîkatiya zabitayan e. Ulker diyar kir ku avê nabînin ku bidin hespên xwe.

Tamer Karelî jî diyar kir ku beriya hiblijartinan bi Kocaoglu re axivîne û wiha got: "Dema ku em ji bo hevdîtinê çûn çapemeniya herêmî êrîşî me kirin û gotin 'qereçiyan bi ser şaredariyê de girtine'. Li Îzmîrê bi salan e Roman vî karî dikin. Li bajar bi çavekî baş li me nanêrin. Em parçeyekî vî bajarî ne. Çapemeniyeke rast derneket û negotin 'Qereçî çûne mafê xwe dixwazin.' Em naxwazin êdî cudakarî çêbibe. Em rûyê ken ê vî bajarî ne." Karelî got ku şaredar piştî hilbijartinê ew ji bîr kirine. Ji ber vê yekê xwest ku şaredar xwedî li sozên xwe derkeve. **ÎZMÎR**

## Li Erdexanê berf barî

Demsala biharê êdî bi dawî dibe û havîn tê. Lê ligel vê yekê jî li hin deverên Kurdistanê berf dibare. Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin li deverên bilind ên bajarê Erdexanê ligel hatine havînê jî berf bariye. Li gorî rayedarên meteorolojiyê di rojên pêş de jî li Erdexanê baran bibare û demeke bandora xwe bidomîne. Ji ber vê yekê jî welatiyên heremê hatin hişyarkirin û hate xwestin ku ji bo encamên ne baş dernekeve tedbîr bên girtin. **ERDEXAN**

## Çavekî wî reş yek jî şîn e

Li navçeya Wêranşara Rihayê zarokê bi navê Azad Tepedelen ji rengên çavên xwe eleqeyeke mezin dibîne. Tepedelen dibêje ku hevalên wî jê re didêjin "pisîka Wanê."Azad Tepedelen dema ku ji dayik bûye çavekî wî reş yek jî şîn e. Azadê biçûk dibêje ku ji ber rengên çavên wî jê re dibêjin pisîka Wanê lê ew ji vê yekê aciz nîn e. Bavê wî Hasan Tepedelen jî der barê mijarê de got ku 5 zarokên wî hene lê tenê çavê Azad wisa ye. Hasan Tepedelen diyar kir ku piştî ku Azad ji dayik bûye wan dîtiye ku rengên çavên wî cuda ne û ew birine bijîşk. Bijîşk jî gotiye ew yek pisgirêk nîn e û ji ber vê yekê jî ew niha rehet in. **RIHA**

